



# REWŞEN

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya

Newroz	* Şefik BEYAZ
Destana Zehak û Ferîdûn	* Jafar NEJAD
Siyaset û Ronakbîrêñ Kurd	* Cemil GÜNDÖĞAN
Kışık û Kurd	* A. ÇIYAREŞ
Kürt Dilinin Dünya Dilleri İçindeki Yeri	* A. BALI
Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac	* J. ESPAR
Di Kurdî De Eyleta Bêje, Biwêj û ...	* Amed TÎGRÎS
Kurd Le Sovyetî Caranda (Soranî)	* Mehabad KURDÎ
Zman û Rastnîvis	* F. Huseyn SAGNIÇ
Mirin û Jiyan	* Hüseyin KAYTAN
Li ser Zimanê Tirkî Bandora Kurdî	* Mamosteyê NENAS

Adar - Nîsan  
1993

Hejmar  
10



...

*Lê dem didît, li tariyê, yekî gernas  
Ew Kawa ye, xwedî îsyan, hesinkar e  
Ew Mazlum e, li dijî zilmê berxwedide  
Ew mîna ye, xwedî agir, xwedî hêvî, xwedî qewet  
Li zindanê bo gelê xwe fidakar e*

...

*(Şanoya Jiyana Nû, kurtelîstika Newrozê)*

**REWSEN**

Kovara Kurdi ya çandî,  
hunerî, wêjeyî û zanyarî

Mehê hejmarek tê weşandin.

Li ser Navê MKM Ltd. Şti. Xwedî:  
Hüseyin Kaytan

Berpîrsiyara Nivîsaran:  
Edibe Şahin

Birêvebirê Giştî yê Weşanê:  
M. Şefik Beyaz

**Redaksiyon û Rêzkirina  
Nivîsaran  
REWSEN**

**Navnışan:**  
Tarlabası Cad. 128  
Beyoğlu / İSTANBUL  
Tel: (1) 254 76 28  
Fax : (1)254 48 65

**Sertên Abonetiyê:**  
**Nav Welêt:**  
6 meh: 72.000 TL  
1 sal: 144.000 TL

**Derveyê Welêt:**  
6 meh: 30 DM  
1 sal: 60 DM

**Bank:**  
Edibe Şahin  
Hesap No: 0527432-9  
Döviz Hesap No: 3001696-4  
Yapı Kredi Bankası  
Taksim Şubesi  
Taksim / İSTANBUL

Qapax : Metin DURAK  
(Jîna Min - Çapaxçûr)

Çapxane:  
Aydınlar Matbaacılık

**NAVEROK****Rûpel**

Sergotar :

REWSEN ..... 4

Newroz :

Şefik BEYAZ ..... 5

Destana Zehak û Ferîdûn :

Jafar NEJAD ..... 8

Siyaset û Ronakbîrên Kurd :

Cemil GÜNDÖĞAN ..... 13

Kişik û Kurd :

A. ÇIYAREŞ ..... 17

Kürt Dilinin Dünya Dilleri İçindeki Yeri :

A. BALI ..... 21

Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac :

J. ESPAR ..... 26

Niştimanâ Xwe Binase (Agiri) :

Rojê CIVAKNAS ..... 31

Di Kurdî De Eyleta Bêje, Biwêj û Organêni Mirov :

Amed TÎGRÎS ..... 33

Hevpeyîn Bi Feqî Huseyn SAGNIÇ re :

REWSEN ..... 37

Basekî Giştî Derbarey Kurd Le Sovyetî Caranda (Soranî) :

Mehabad KURDİ ..... 40

Zman û Rastnîvis :

F. Huseyn SAGNIÇ ..... 45

Mirin û Jîyan :

Hüseyin KAYTAN ..... 48

Li ser Zimanê Tirkî Bandora Kurdî :

Mamosteyê NENAS ..... 52

Zarokê Agiri :

Şevîn CIVAKNAS ..... 54

Danasına Pirtûkan : "Bir Kürt Aydînîndan Mustafa Kemal'e Mektup"

Cemil GÜNDÖĞAN ..... 56

Muzîka Kurdî :

REWSEN ..... 59

Nameyên Xwendevanan :

Rewşen ..... 60

Ferhengok :

REWSEN ..... 62

# SERGOTAR

## Xwendevanên delal,

Di jiyan gelê Kurd a civakî û rêzanî de guherîn gelek biley çêdibin. Ev guherîn ne tenê di jiyan siyasi de, herwiha di qada çandê û wêjeyê de jî heye.

Hin çîn û tebeqeyê neteweyî û welatparêz ku berê xwe ji tekoşîna azadî ya çekdarî dûr dihiştin, niha li vê tekoşînê germ dinêrin û xwe nêzik dikan. Anku giyan û bîra neteweyî û welatparêzî di van rêxistin û tebeqayan de geş dibe. Di nav hêzên neteweyî de têkiliyeke nû destpêdike. Li ser bingeha parastina mafêneteweyî, xurtbûn û pêşvexistina van têkiliyan daxwaza gelê Kurd e.

Ev domana nû bi xwe re têkiliyên nû derdixe himatê. Ev têkilî jî, bi taybetî di qada çandê de zêdetir xwe diyar dike. Ev rewş jî, ji bo parastin û pêşvibirina çand û zimanê Kurdî hin derfetên nû derdiye holê. Divê ev doman û encamên vê domanê gelek baş bêñ nirxandin. Ronakbîrê Kurd ku mijûlaya wan bi çand, pîse, wêje, ziman, dîrok û hwd. re heye, divê hemû di sazgehêñ çanda neteweyî de bêñ berhevkirin, ji bo parastin û pêşvexistina ziman û çandê divê bêñ birêkxistin. Birêvebirê MKMê bi vê bîr û baweriyê xwe ji nû ve bi rêk û pêk dixin û li gor vê ramanê gav davêjin.

Ji lewre em dizanin ku ziman û çanda Kurdî, rehêñ jiyan gelê Kurd e. Ev damar, divê gelek qenc bêñ xwedîkirin. Ew jî, bi politikayeke neteweyî çêdibe.

Kongreya Enstituya Kurdî, ya ku di 17'ê Nisanê de li Stembolê pêk hat, di vê çarçovê de mirov di-kare binirxîne. Ji ber vê yekê, ev kongre, di mêtûya Enstituya Kurdî de ji bo pêşveçûn û xurtbûnê gaveke girîng û mezin e. Di domana pêşerojê de wateya vê pêgavê, dê çêtir bê têghîştin.

## Xwendevanên delal,

Hewcedariya me, ji herkesi bêtir, bi zanîneke zanyarî heye. Ji ber vê yekê, em bi çaveke rexneyî li her tiştî dinêrin. Rûpelên Rewşenê ji xebatêñ lêkolîner û lêgerînerêñ Kurd re vekirî ne. Herweha, her xebat û nivîsar jî, ji rexneyê re vekirî ye. Ji lewre, rexne û minaqeşe riya me ronî dike.

Di vê hejmarê de, nivîsareke Mehabad Kurdî heye. Ev gotar, rewş û jiyan Kurdêñ Sovyeta kevn tînê zimêñ. Gotar, bi zaravayê Soranî û bi awayeke xweşik hatiye nivîsandin. A. Tigrîs, di bin serenavê "Dest" de gelek termêñ Kurdî yên ku di nav gel de têñ xebitandin, berhev kiriye û ev xebata xwe ya hêja pêşkêşî xwendevanên me yên delal dike. Birêz N. Çiyareş, li ser kişikê, anku satrancê xebateke hêja derxistiye holê. Em vê xebatê di rûpelên Rewşenê de pêşkêşî xwendevanên xwe yên delal dikan. Di vê hejmarê de, du nivîsarêñ C. Gündoğan hene. Yek ji wan danasîna Nameya C. Bedirxan e ku ji M. Kemal re şandiye. Ya din jî, têkiliya siyaset û ronakbîrêñ Kurd dide diyar kirin. Mîrza Jafar Nejad, destana Zehak û Ferîdun, ji zimanê Norwecî wergerandiye Kurdî. Em wisa bawer in ku, ji vê xebatê dê gelek fêde bê girtin. Rêzenivîsê birêz J. Espar ku bi navê "Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac" dihat weşandin, di vê hejmarê de diqede. Me ji bo xwendevanên xwe, bi seyda F. Huseyn Sagnîc re li ser Enstituya Kurdî û pirsgirêkîn wê hevpeyvînekê çêkir. Em vê hevpeyvînê di vê hejmarê de diweşînin. Nivîskarê me, birêz M. Şefik Beyaz, li ser dîrokçeya Newrozê bi awayeke kin radiweste û bala xwendevanen dikşîne li ser hin xalan.

Bi hêviya hevdîtinê ya di hejmareke nû de, bimîn xwes.

REWŞEN

# newroz

**Sefik BEYAZ**

Ez dixwazim bi gotinekê birêz  
 Î. Beşikçi ku her tim dubare di-  
 ke, dest bi nivîsarê bikim. Birêz  
 Î. Beşikçi weha dibêje "Hewceda-  
 riya kê bi agahdariya zanyarî he-  
 be, ew hildiberîne" Di Rojhilata  
 Navîn de xelkê ku bêhtir tê perçî-  
 qandin gelê Kurd e. Hewcedari-  
 ya gelê Kurd jî, ji her mîletî zehf-  
 tir bizanîn û zanîneke zanyarî  
 heye.

Gelê Kurd heke dixwaze ku ji  
 vê jiyana bêbextewer û kole riz-

gar (xelas) û  
 azad bibe, pê-  
 wist e ku za-  
 nîneke zanya-  
 rî bafirîne û  
 wergire. Ev  
 domana ku  
 gelê Kurd iro  
 tê de derbas  
 dibe, pirsyâ-  
 ra me ya jorî  
 pozîtfî diber-  
 sivîne. Belê  
 ev domana  
 ku Gelê  
 Kurd iro tê  
 de dijî, pêva-  
 joya ronahî-  
 bûnê ye. Gelek mirov ji vê re "ro-  
 nesansa Kurdi" dibêjin. Civaka  
 Kurd iro pirsyariya dema xwe ya  
 borî, ya ku iro tê de ye û ya bê di-

ke. Xwe ji nû ve hildiberîne.

Ji ber vê yekê ez dibêjim heke  
 zanîneke zanyarî nîn be, ev do-  
 man bi şeweyleke pozîtfî bi pêş ve  
 naçe. Çand, tevahiya nirxên (hê-  
 ja) geleki ye ku ew afirandiye û  
 lê xwedî derketiye. Çand, yek ji  
 taybetiyêne gel ê herî girîng e. Di  
 civakeke çinî de helbet mirov ni-  
 kare dabaşa çandeke xwerû û we-  
 kîhev bike. Lîbelê mirov dikare  
 qala nirxên neteweyî yên hevpar  
 (muşterek) bike. Ji xwe yên ku ne-  
 teweyekê li ser piyan dihêle û di-


yî tişteke xwezayî (tebii) ye. Her-  
 weha tişteke erêni (pozîtfî) ye jî.

Her çandek -divê neteweyî an  
 jî çinî be- ji çanda çin û civaka  
 pêsiya xwe gelek tişt distîne. Gel-  
 lê Kurd çend hezar sal in li ser  
 axa ku lê dijî çandeke dewle-  
 mend afirandiye. Lî di vê çandê  
 de para xelkên cîran jî heye. Be-  
 revajiya vê jî rast e. Çand û şare-  
 zayıya ku gelê Kurd afirandiye ji  
 bo bajarvanî û şarezayıya dinya-  
 yê gencîneke (xezîne) dewle-  
 mend e.

Newroz jî, yek jî wan nirxan e  
 ên ku gelê Kurd afirandiye. Du  
 dîmenê (boyut) Newrozê hene.  
 Yek efsanewî û yên din jî, civakî  
 ye. Anku Newroz hem şadimanî-  
 ya sala nû û hem jî pîrozkirina  
 roja azadî û rizgariyê ye. Naver-  
 ka Newrozê bixwe li dijî tarîtiyê,  
 serketina ronahiyê, li dijî zivis-  
 tanê, serketina biharê, li dijî zilm,  
 zordarî û koledariyê, serke-  
 tina azadiyê ye. Newroz bi vê na-

verokê ve di  
 nav çanda  
 Kurdi de cî  
 girtiye.

Di derhe-  
 qê Newroz û  
 destana Ka-  
 wa de dîtinêñ  
 cuda hene.  
 Lîgerînerêñ  
 dîroka kevna-  
 re jî, di vê ba-  
 betê de wek-  
 hev nafikirin.  
 Hozanê Per-  
 san yên nete-  
 weyî Firdew-



be sedemê jiyana wê, ev nirxên  
 neteweyî yên muşterek in. Xwe-  
 dîderketina li van hêja û berma-  
 yan ji bo ref û tebeqeyênetewe-

sî di Şehnameya xwe de ku di  
 sedsala 10'an de hatiye nivîsan-  
 din, weha dibêje: "Newroz, şiyar-  
 bûna xwezayî û roja rizgarbûnê

ye." Li gorî Firdewsî Dehaq qralê Babile ye. Lê ji nijada Ereban e. Hikimdariya Dehaq hezar sal ajotkiye. Kawayê hesinkar ji bo ku xelkê ji bin zordestiya Dehaq rizgar bike û Ferîdun derxe ser textê, gelê Aryayê di bin serokatiya Ferîdun de birêk dixe. Ferîdûn li hemberî Dehaq şereke dijwar dajo û di dawî de li çiyayê Demawendê serî ji Dehaq dibe û biserdikeve.

Ferdûn di vê çiyayê Volkanîk de Dehaq hepis dike. Ferîdûn di vê rojê de hikimdariya xwe diyar dike. Ev roj, roja cejnê ye. Ev roj jî, 31'ê Tîrmehê ye. Îranî ji vê rojê re Îda Kurdi dibêjin. Li gorî him lêgerînerên dîro-

ka kevnare, efsaneyâ Dehaq weha ye:" Qralê Medya Keyaksar berî zayînê di 31'ê Tebaxa 612'an de Payitexta Asûran Nine-wayê fetih dike û Dehaq jî dikuje. Ev bûyer ji vê rojê ve di bin navê Cejna Newrozê tê pîroz kîrin".

Heredot di derheqê efsaneyâ Dehaq de weha dibêje: Qralê Medya-Ariya Deyokes (bz. 728-673) di nav gelê Asûrî de li hemberî Dehaq serîhildanek amade dike. Gel li dijî dehaq serîhilde û ew ji têxt dixin. Paşî Keyaksar bi timî dawî li desthilat-dariya Asûriyan tîne.

Dehaq, di Awesta de ejderha-yeke sêserî, sêling, şeşçav û he-

zar milî derbas dibe. Di Awesta de Kawa li ba Ferîdûn û di bin Pêşengiya Ferîdûn de li hemberî Dehaq şer dike li gorî hin dîtinan: Dehaq simgeya xirabî û nebaşiyê ye. Navê lehengê ku li hemberî Dehaq şer dike, Xweda Thratona ye. Roja ku Dehaq tê kuştin, li Mezopotamya û Îran'ê gelek baran dibare û zêdahiya erdê jî pirtir dibe. Ev roj jî, 21'ê

hemberî hev micadele dikan. Her tim di navbera xwedayê ronahî û xwedayê tarîti û xerabiyê anku ejderhan de şer heye. Sîlehê Xwedayê ronahiyê jî, her gav brûsk û hesin e. Di van şeran de ejderha, ya tê kuştin, an jî, di çiyayekî volkanîk de tê hepis kirin.

Ev bûyer di pirtûka Hindîyan a pîroz "Rîgveda" de weha derbas dibe: Di navbera Xweda Îydra

ra û ejderha Trîta de Şerekderdi-keve. Ev ejderha, serkaniya avan tev digre û zora xwedê dibe. Trîta ji xwedê, ji bo her rojekê mejiyê du mirovan dixwaze.

Xwedê neçar dimîne pêre lihev tê. Kelkê

Hindistanê soz di din ku her roj mejiyê du mirovan bidin ejderha. Ev rewş pêlek dom dike. Lê di dawî de ejderha tê kuştin.

Di mîtolojiya Yewnaniyan de jî, bûyereke wek vê heye. Xweda Zeus û ejderha Typhon bi hev re şer dikan. Di vî şerî de Hephaystosî hesinkar arîkariya Zeus dike. Bi vî awayî Zeus biserdikeve û Typhon jî, di çiyayeke volkanîk de tê heps kirin. Lê di mîtolojiya Kurdan de Kawayê hesinkar, li hemberî Dehaq arîkarê kesî nîn e. Serok û pêşeng ew bixe ye. Lehengê şerî jî, ew e. Di dîrokên klasîk-kevnare tev de mirov rastî mîtolojiyên weha wekhev tê. Mînak di mîtolojiya Hîtitan de di navbe-



Adarê ye. Xwedayê qencyîye yên ku di efsaneyâ Dehaq de derbas dibe, piştî demeke dirêj wek mirovan hatine nasîn. Di derheqê efsaneyâ Kawa de gelek dîtinan jî hev cuda hene. Lê niqteya ku lêgerîner tev li ser lihev tê, ev e: Seraya Dehaq li Mezopotamya û li ber çemê Dicleyê ye.

Dînê Zerdeş Pêxember li ser bingehêke duyalî (dualizm) ava bûye. Li gor vê felsefeyê tu tiştek ji aliye tu kesevê de ji nebûnê nehatiye afirandin. Her tiş ji xwe de heye. Dijber, her tim bi hev û li dijî hev têdikoşin. Anku qençî û xirabî, ronahî û tartî, havîn û zivistan, azadî û koletî, insan û tebîet her tim bi hev re ne û li

ra xwedayê bagerê mar ejderha Îluyanka de şerek derdikeve. Di vî şerî de ejderha Îluyanka tê kuştin. Bi vî awayî jî zivistan di qede û bahar destpê dike. Ev jî destpêka baharê û zêdahiyê ye. Cejna Hîtîtiyan "Prulî û Anaâtîs" di destpêka baharê (21 Adarê) de wek Newrozê tê pîroz kirin.

Di Mîtolojiya Babîlan de Xweda Marduk li hemberî ejder Tiyatmat şer dike. Xweda Marduk biserdikeve û Tiyamat dikuje. Ev bûyer wek cejneke mezin û bi şadimaniyeke geş di 21'ê Adarê de tê pîroz kirin. Dumuzî, xwedayê ronahiyê di mîtolojiya Sumeran de sîmgeha zindegî û jiyanê ye. Vejîna Dumuzî hersal di 21'ê Adarê de ye. Ev roj her sal di 21'ê Adarê de wek cejna Newrozê hatiyê pîroz kirin. Li Brîtanya heta sala 1752'an jî cejna sersalê -Sala Nû- di 21'ê Adarê de dihat pîroz kirin.

21'ê Adarê ji aliyekê ve şiyarbûna xwezayê, destpêka zêdahiyê, xweşî û bexteweriyê û roja wekhevbûna şev û rojê ye. Xelkên Arya û hin xelkên Asyaya pêşîn vê roja rizgarbûnê kulta bi agir û ya sersalê ve girêdane. Bi vî awayî jî, naveroka wê xurtir û watedartir kirine.

Bi rastî Newroz cejna sersalê, hîna ku Nînewa ji aliye Medan ve nehatibû fetih kirin jî, hebû. Mirov vê rastiyê di Zend-Avesta de dikare bibîne. Li gorî Zerdeş pêxember Newroz, dijberiya ronahî û tarîtiyê, vejîna xwezayê ye. Tekoşîna azadiyê ya li hemberî koledaran e.

Li gorî lêgerîn û lêkolînên ku di vê mijarê de hatine kirin, gelê Kurd hezar sal in ku Newrozê pîroz dike. Gelê Kurd di pîrozkiri na Newrozê de her tim serhildan

û berxwedanê li pêş girtine. Ev serîhildan û berxwedan di kûra-ya çanda Kurdan de ciheke gi-ring girtiye. Gelê Kurd hersal di cejna Newrozê de li dijî dagirkir û zordestan kîna xwe anîne zi-mîn, xwe bi kincên rengîn ên neteweyî xemilandine û bi van kin-can li sikakan, li meydanan li serê çiyan berhev bûne, serîhilde, mîzgîna azadiyê agirê New-

zekê jî Newrozê 70 sal qedexe ki-rin. Lî tu demê nekarîn ku Newrozê ji hinav û mejiyê gelê Kurd derxin. Bi tenê karîne ku pizotên Newrozê binxwelî bikin. Lî neka-rîne bitefinin.

Bayê bagera 84'ê Tebaxê ev xweliya li ser êgir belawela kir. Ev pizot, di demeke kin de geş bû, pêtén vî agirî bilind bû û her aliye Kurdistanê ronî kir.



rozê pê xistine û Newrozê pîroz kirine.

Digel hin asteng û dijwariyan li her derê Kurdistanê Newroz hatiye pîroz kirin. Di dema Osmanîyan de Newroz bi şeweke serbest dihat pîroz kirin. Li Îran, Iraq û Suriyeyê jî, Newroz, tu dem nehatiye qedexe kirin. Lî piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê, rêvebiriya Kemalist, di-gel nirxên neteweyî yên Kurd Newrozê jî qedexe kirin. Dewleta Tirk di vê demê de li hemberê gelê Kurd teroreke dijwar û kam-panyayeke bê sînor vekir. Dewleta Tirk dixwest ku şexsiyeta gelê Kurd a neteweyî ji holê rake û di nav xwe de bihelîne. Ji ber vê

Gelê Kurd iro Newrozê bi se-rîhildanen mezin hembêz dikan. Dewleta dagirkir vê lehiyê nikare bide rawestandin. Gelê Kurd iro li hemberî koledar û zordes-tan ji bo azadiya xwe têdikoşe. Di vê tekoşînê de li hemberî De-haqêñ zâlim, Kawayêñ hemdem derdikevin qada şer. Newroz, iro ji bo gelê Kurd, berxwedan û se-rîhildan e. Tirsa dewletê ya herî mezin jî ev e. Dewlet, berê Newrozê qedexe dikir, êrîş dibir ser Newrozê, lê niha nikare. Lî dix-waze ku Newrozê ji naveroka wê vala bike. Iro jî lê xwedî derdike-ve, ji xwe re dike mal bi vê awayî jî sextekarî û durûtiya dewletê her diçe diyartir dibe ▲

# DESTANA ZEHAK Û FERÎDÛN

Jafar NEJAD

Wêrger : Gavan KOÇER

*Destana ku  
li ser Dehaq  
hatiye nivîsandin  
bi nav û deng e.  
Ev destan  
ji aliyê  
Jafar Nejad  
ve, ji nû ve  
hatiye afirandin.  
Me ew ji Norwecî  
wergerand Kurdi.  
Nivîskar Jafar Nejad  
ji Ïranê ye  
û Lorî ye.  
Gavan Koçer*

**Zehak**  
Mardas padîsahekî destveki-  
rî, mîrxas û dadmend bû. Ew ji  
malbateke dewlemend û esilzade  
dihat. Bi hezaran bizin, deve û  
mihên wî hebûn. Di bin bandora  
fermandarê Cemşîd de gelek fer-  
mandarên biçûk hebûn. Mardas  
jî, ji wan yek bû. Lawekî Mardas  
hebû, navê wî Zehak bû. Zehak,  
xortekî rind, gîhîstî û siwariyeke  
jîr bû. Ehreman, ji ber ku bikari-  
be li dijî mirovahiyê karên xwe  
yêngenû bikarbîne, ev xort hilbi-  
jartibû. Wî şeytan Îblîs şêland û  
wek biyaniyekê şand welatê  
Ereban, ku bikaribe li dû Zehakî  
bigere.

Îblîs, ji Zehak re got ku di der-  
barê lawê Mardas ê birêz û gîhîş-  
tî de tiştên hêja bibihîse. Ew, ji  
bo dîtina xortekî hewqas birûmet  
ketiye rê û bi hezaran ferseh rê  
girtiye. Zehak, ku berê tu goti-  
nên weha xweş nebihîstibû, kêfx-

weş bû ku car caran li cihêñ dûr  
navê wî jî tê gotin.

Îblîs xweşik bû. Hindik mabû  
wî Zehak bi xwe bawer bikira.  
Wî weha got:

— Ez dikarim ji te re pir tiş-  
tan, ku tenê ez pê dizanim, bibê-  
jim.

Dema wî weha got, Zehak bi  
meraqî guhdarî dikir. Îblîs, bi  
van gotinan Zehak qanî kir:

— Berê divê tu soz bidî min,  
ew tiştên ku ez dibêjim, dê di  
nav me de bimînin û tu wan dê ji  
kesekî din re nebêjî. Ez ci ji te  
bixwazim, divê tu wan bi cih bînî.

Zehak bawerî bi gotinên Îblî-  
sê anî û jê tiştek nepirsî. Lê,  
sond xwar ku ew bê deng bimîne  
û soza xwe bi cih bîne.

— Guhdarî bike, got Îblîs, ka  
ez ji te re ci dibêjim... Bavê te  
Mardas pîr dibe, lê tu xort i. He-  
ger li şuna wî tu welatê xwe bi rê  
ve bibî, baştır dibe. Tu mirovekî

baş û, mafê te heye tu bi rê ve bibî. Bavê xwe bikuje û welatê wî jê bistîne.

– Ez nikarim bavê xwe bikû-jim! Ew bi min şad e û mirovekî baş e, ku li dijî min jî her wext baş difikire.

Îblîs dixwest wêraniyê bide Zehak:

– Bi min bawer be, got Îblîs. Tu dê ne tenê welatê bavê xwe bi rê ve bibî. Zemanek wê bê û bi alîkariya min ve, tu dê gerdûnê gişt bixî bin destê xwe.

Zehak bi wê kêfxweş û zinde bû, lê cardin jî, got:

– Ez nikarim bavê xwe biku-jim. Ji bo ew tiştan, ên ku tu dibêjî, riyeke din bibîne, ka ez çawa dikarim bigêhîjim miradê xwe.

– Bê vê, tu riyek jî tune, bersivand Îblîs. Di vê kîliyê de dengê wî dengê camerekî ku celb bike û mirovê zinde bike nebû, lê wek dengê camerekî stemkar bû.

– Ji bîr meke, Zehak, te soz daye min. Ez ji te çi bixwazim, tuyê wê bi cih bînî.

Zehak bi sozên Îblîsê hatibû qanâkirin, lê ji xişma wî jî tirsîya bû. Wê çaxê ji şetanê re serî danî û got:

– Dê ji min re bibêje ka tu çi dixwazî, ezê bikim.

Û Îblîs ci got, wî bi bêdengiyê guhdarî kir.

Mardas, ji bo ku birame û ber-pirsîriyîn serdariya xwe ji bîr bike, her şev tenê li baxçeyê xwe diçû gerînê. Nokerên wî herdem çend gav li paş wî diman ku wî aciz nekin. Ji ber ku Mardas ji bêdengiyê hez dikir û bayê êvarê yê hênik û bi bîhna kulîlkan ve bigere, wan lambe jî, li ba xwe nedigirtin. Ew herdem di eynî rê de

diçû. Rê teng bû û di nav kulîlkan de bû. Wî wilo riya xwe nas dikir ku êdî ne hewce bû di dema gerîna xwe de li wê binêre. Li ser vê rê Îblîs niha quleke mezin vekiribû û bi giyayê hişk tijî kiribû.

Vê şevê jî, wek her şevê din, Mardas di eynî rê de diçû. Lê nedizanî ka di riya wî de çi heye. Dema rastî qulê hat, bi herdû lingên xwe ve ket wê qulê. Bi qê-rîn û gazînên wî ve, nokerên wî bi bazdanê hatin hawara wî. Lê heta wan lampe, bend û derence anîn, Mardas mirî bû. Bi vî awa-yî Zehak serdariya welatên Ereban xist destê xwe.

Îblîs pirsî:

– Tu ne dilgeş î?

Zehak dilgeş bû, û êdî nedixwest zêde li ber mirina bavê xwe bikeve.

– Tuyê bibî padışahê hemû gerdûnê, got Îblîs.

Îblîsê welat berda û raspandîna Zehakê kir. Edî welat di destê Zehak de bû, çawa bixwesta, wilo bi rê ve dibir.

Ji qedereke şûn ve Îblîs bi kincen nû, wek xortekî zana û kenî vegeeria, hat Arabiyayê. Ji bo destûrê çû pêşberiya Zehakê û got:

– Fermandarê min, ez aşpêjekî bi nav û deng im, bi her celebê dikarim xwarinan çebikim, ku te tu car tâhm nekiribî. Heger tu di metbaxa padışahê de şûnekê bidî min, tuyê qet poşiman nebî.

Zehak ew ji şûn ve neşand û Îblîs jî, soza ku dabû bi cih anî. Nanen ku wî çedîkir hewqas tâhmkirî bûn û ew jî hewqas zana û xwedî xeberdanen bû, ku gelel zeman derbas nebû, Zehak ew kir serokê metbaxê. Ji vê rojê şûn ve, ew êdî metbax idare dikir

û biryar da. Aşvanê din jî, di bin destê wî de bûn.

Di vê zemanê de mirovan ne hêk, fêkî, zadên din, ku ji aliyê Xwedayê herî mezin Urmazd (Hurmuz) ve dihatin ajotin, dix-warin. Ji lawiran tenê şîr û pûrt dihat girtin, û heta dema Ehremanê wan goşt nedixwarin. Îblîs, ew hîniya serjekirin û xwarina goşte lawirê çarling û çûkan, ên ku difiriyan, kirin.

Dema Îblîs bû serokê karêن xwarinê, Zehak û mifteyên kile-rên wî xistin destê xwe û dest bi cihanîna xwastinê Ehremanê yên neçê kir. Berê ji bo Zehak hêkek qeland. Padışahê ji vê pir hez kir û ferman da ku ji vê şûn ve Îblîs her roj jê re ji hêkê celebek xwarin çêbike. Îblîsê qede-rek ew kir; jê re xwarin çêkir û celeb celeb baharat bi kar anî. Baharatan tahmeke pir xweş di-dayê xwarinê. Edî ji hêkan ci celeb xwarinbihata çêkirin, Zehak ew bi kêf û xweşî dixwar. Roj bi roj ew ji xwarinê, ku ji hêkan nedihat çêkirin, çedîkir.

Şevekê, dema Zehak ji bo xweşçêkirina xwarinê pesnên Îblîsê dida, Îblîs vegeeria û got:

– Fermandarê min, te hê xwarineke wer bi tâhm û lezêtê, ku bi taybetî ji bo te çêkim, nexwariye. Gelo destûr heye ku ez sibê ji bo we xwarineke hê bi tâhm û lezeti amade bikim?

Zehak weha got û lêvên xwe dalêstin:

– Lê, heger mimkûn be, jixwe ji te baştır kesek nikare vî karê han bike.

Ramana Zehakê çûbû ser roja bê. Wî meraq dikir, ka aşpêj jê re kîjan celeb nan çedike. Ji ber meraqan ew wê şevê pir kêm raket. Tahmxweşîya xwarinê ew

geş kiribû.

Serê sibê Îblîsê ji kew û çorê xwarineke delal çêkiribû. Dema Zehak çav li xwarinê ket û bîhna wê naskir, zêdetir birçîbûna xwe seh kir û bi awayekî ku bi rojan xwarin nexwariye, xwe avêt ser sifrê û dest bi xwarinê kir. Dema teyfik vala bûn, wî got:

— Li ser gerdûnê ji vê xweştir û tahmtir xwarin nayê çêkirin.

— Gotina we ne rast e, padîşahê min, got Îblîs. Xwarina sibê wê baş û çêtir be.

Roja din Îblîs, ji goştê berx û mirişkan xwarinekê çêkir. Goşt xweş sor bûbû. Hê piçike hatibû xwarin, Zehak xwe negirt û got:

— Hevalê min, ez bawer na-kim ku tu qet carek jî, ji xwarina iro xweştir xwarinekê çêkî.

Îblîs kenî:

— Çawa ku nanê iro ji yê duhî lezetur bû, wê yê sibê jî, ji yê iro lezetur be.

Li ser vê Zehak bê aram bû. Xew neket çavên wî ku sibê bê. Û Îblîs derew nekiribû. Roja din wî golekeke, ku di şerebê de sor kiribû, pêşkêşî Zehakê kir. Kêfa Zehakê bi xwarinê ve wilo hatibû ku, bê zanabûnê binê teyfikan dalêst. Îblîs jî, bi ecebeke giran li wî dinêriya.

Zehak nedixwest zemanê xwarinê xilas bibe, ji ber vê yekê jî li ser xilasbûna xwarinê ve axek kişand û eceb ma, ka çima ew xwarina ewqas xweş carek tenê tê xwarin û zemanê wê zû xilas di-be. Ji Îblîs re got:

— Li ser gerdûnê heta niha, tu mirovêkî jî, wek te karekî hêja bi cih naniye. Ji min bixwaze, tu çi dixwazî bixwaze, ezê bidim te.

— Fermandarê min, ji bo min ji te destûr girtina pêşkêşkirina xwarinê û bizanim ku bi vê mi-

radêñ te bi cih hatine, bi xwe xe-lateke mezin e. Lê, cardin jî ji te daxwazeke min heye, her çend ez xwe wek mafdarê stendinê ne-bînim jî.

— Ev ci ye?

pirsî Zehak.

— Ku tu destura min bidî, ezê piyên te maç kim.

— Ez dê vê desturê didim te, got Zehak.

— Di derbara rûmeta te de wek nîşanek...

Wek ku ew qiyasê Zehakê xwedî qedir û qiyemet be, an xis-mê wî, an jî hevaleke wî yê nêzîk be, sakoya Zehakê ji milêñ wî avêt kêlekê û dest bi maçkirina herdû piyên wî kir. Û di kêliyek de jî, ji ber çavan winda bû û Ze-hak bi tenê ma.

Zehak mat mabû. Wî şokeke derbas dikir, nedikaribû wan tiş-tan ji hev derxîne. Aşvanê wî, wek Sawarek, wek Ehrîmenek ku ji xwe ew bû, ji holê rabûbû. Lê, Zehak ji nişke ve li ser milêñ xwe êşen giran seh kir. Ew li paş xwe nêri û dît ku li ew derên wî, yêñ ku şeytan maç kiribûn, eynî li wir serê du marêñ reş xuya dikir. Zehak nêri ku marêñ felckirî hê diçin mezin dibin, heta ku qiyasê marekî mezin ku êdî nîvdî-rejiya wan li ser milêñ wî cih nedibû. Edî mezinahiya gewdeyêñ marêñ reş sekinibû. Ew li ser milêñ Zehakê dihejîyan, diçûn, di-hatin û zimanêñ xwe derdixistin derve. Deng jê derdiketin. Ze-hak bi awazeke bilind deng li alî-karvanêñ xwe kir û ji wan alîkarî xwest. Mirovêñ wî bi bazdanê ha-tin, lê nikaribûn ji wî re alîkarî bi-kin. Kirin nekirin, nikaribûn bi qeydeke jî, maran ji Zehakê dûr bixin. Wan çiqas mar jê dîkirin û davêtin, serêñ wan ji nû ve ges di-

bûn û ew li şûn ve bi hêztir û xur-tir dihatin.

Ew rewşa han, bi roj û heftan wiha domiya. Edî Zehak, tu çare nedît, bijîşk û zanayêñ xwe gişt, ku li welatêñ Ereban bûn, anî ser hev û got:

— Yêñ ku min ji vê kul û bela-yê xelas bikin, ezê wan bi xelatêñ mezin xelat bikim.

Lê tu tiştekî jê re nebû der-man, heta ew roja ku Îblîs vege-riya. Ew içar wek mirovêkî kal û bijîşkekî zana vege riya bû. Ji Ze-hak re weha got:

— Mîrê min, ji bo ku tu ji wan maran rizgar bibî, tu rêkek jê xu-ya nabe. Ji lewre hatiye birtyar dan, ku heta mirina te tu dê bi vê êşê bijî. Ne hewce ye ku tu ji bo derxistina wan hewqas xwe bê-şînî. Heta tu vê bikî, xwarin bide wan, wek ku ew dixwazin. Wê çaxê ew dê pê ve kêfxwes bibin û êdî te aciz nekin. Tu û ew, dê di aşîtiyê de bijîn. Kî dizane, dibe ku rojeke ew ji têrbûnê rakevin û bimrin.

Wiha peyivî Îblîsê fêlbaz. Her-çiqas wî derew dikir jî, Zehak ba-werî bi wî anî.

— Divê ez ci celeb xwarinê bi-dim wan?

pirsî Zehak bi mereqê. Di ber-siva xwe de:

— Her roj mejiyêñ du zilamêñ bi hêz,

got Îblîs. Ji lewre ew xwestine-ke Ehreman bû ku divêt bi wî ha-wayî ji dinê her roj du mirov, he-ta ku mar jiyan, kêm biba.

— Gotina te, dê bê cih, got Zehak. Dema Îblîs karê Ehreman ê nexweş da dest pê ki-rin, ew berda û çû.

Ji wê rojê şünde her roj, ên ku diçûn, herdû mar bi ev xwarinê nebaş hêztir dibûn. Zemanê

ku Îblîs soz dabû, dê Zehak serdariya dinyayê bi dest xista, nêzîk dibû, lê Zehak her ku diçû har û xerabtir dibû, çavçilûs û çavşor dibû. Kêf kêfa bavê giştî neçeyiyan Ehreman bû. Ji ber ku wî bi alîkariya Îblîs û Zehakê xwe bikûjin. Û wî şezadeke Ereb guhertibû û kiribû stemkarek. Zehak çiqas xirabtir dibû, fermandarê wî, Cemşîd jî hewqas dibû xwedî fîz û quretiyê. Ew weha dom kir, heta ew roja ku şezade û fermandarê wî yên biçûk êdî nikaribûn di bin barê zordestiyê de rabin. Wan pey li hev xebatkariya xwe ya bi Cemşîd re xistin û ketin li du miroveke gihiştî û bi hêz, ku bikaribe wan di meşa li dijî Cemşîd de bîne li ser hev û bi rê ve bibe. Herçiqas paşgotinî -yek belav bûbû û digot, ew cinawirek e- cardin jî ew cûn ba Zehak û ji wî xwestin ku ew bi-be serokê wan. Zehak wek mirovekî bê tirs û bi hêz dihat nasîn. Wan, bi serlêxistina Zehak a ji bo ku ew bibe serokê wan, nedizanibûn ku wan bi wî hawayî lis-tikêن Ehreman bi cih anîne. Wan ji bo rêvebirina xwe Zehak hilbijirîn. Ew, ji Cemşîd bê armanctir û paşverûtir bû. Dema zemanê wî hat, Zehak tevayıya şezade û wezîrên xwe anîn ser hev û li dijî Cemşîd ji wan artêş-eke mezin pêk anîn û ket pêsiya wî. Dema Cemşîd ew dîtin, ket ber xeletî û çewtiyêن xwe yên ku wî kiribûn. Lê êdî dereng bûbû. Wî pare û koşka xwe dan Zehak ku wî bibexşîne û nekuje. Lê, Zehak laşê wî ji navê kir du bes û bi wî qeydê jî dawiya serdariya Cemşîd, ku ji bo mirovahiyê ew-qas tiştên hêja kiribû, hat.

Niha giştîyan ji bo Zehakê çepik lê dixistin û ew ji bo hemû

gerdûnê wek fermandarekî mezin û bi rûmet didîtin. Zehak, di dilê xwe û genû de bi destxistina koşka Cemşîdê dilşad bû. Wî xwe li wir li ser pavdanka Cemşîd, ku ji lingên filê hatiye çeki-rin, rûniştî û taca Cemşîd jî li ser serî didît. Wî tevayıya dewlemen-diya Cemşîd xist destê xwe û dixwest bi darê zorê bi herdû keçikênen Cemşîd ên xweşik re bizewice.

Her roj, Zehak hêztir û nebaş-tir dibû, ew hêz û nebaşıya wî dorpêça wî aciz dikirin. Edî tebat nemabû ku kesên hawîrdora wî, ev biparêzin. Yên ku ew kiri-bûn rîbirê xwe niha dixwestin ji wî xilas bibin. Lê, ew nedîwêrîbûn li dijî wî serî rakin.

Ji bo her rojên ku derbas dibûn, ji bo xwarina marêñ Zehak mejiyêñ du xortan dihat koşkê.

Bi hezar salan gerdûn ji aliyê Zehak ve hat birêvebirin. Rindî bi tevayıji holê rabû û şûna wî xi-rabî girt. Di vê zemanê de her şev du xort dihatin serjêkirin û ji marêñ Zehak re dibûn xwarin.

Rojêk du xorten Îranî têñ ba hev. Li ser gelek tiştan dipeyivin. Ji wan yekî got:

-Divê em li mitfaxê ji xwe re karekî bibînin. Bi vî awayî em di-karin jêhatbûna xwe bidin axaf-tin û ew bedbextiyêñ ku li koşkê dibin ji binî ve rakin. Ew li der û dorê geriyan û hîniya hunera aş-vaniyê bûn û bi vê jî li mitbaxê kar girtin. Hê gelek zeman derbas nebibû, dora çêkirina xwarin-nê hat wan. Mejiyê miyekê bi yê xortekî re tevlihev kirin. Xortê din jî bi veşartinê felitandin û lê kirin ku ji kesek re nebêje, lê xwe veşêre.

Bi vî awayî ew du sed miro-

vê xort ji mirinê felitandin. Ji van dused mirovê xort jî civata Kurdan pêkhat.

### Xewna Zehak

Hê 40 salê Zehak mabû ku bimrî, şevek di xewna xwe de sê şervanan dibîne. Du pîr û di nav wan de jî yekî xort. Yê xort xwe wek şezadeyekî pêçandibû û di serê wî de jî çakûçeke darîn ku di forma serê gayek de bû, hebû. Ew raste rast çû ba Zehak û bi çakûçe li wî da. Dest û lingên wî jî bi bendê girêdan.

Zehak bi awazeke xirab ji xe-wê rabû. Ew tırsiyabû. Dema ji-na wî, Arnavaz û nokerêñ wî ev rewşa han dîtin, bi bazdanê hatin ba wî. Arnavaz got:

-Mîrê min, çi li te qewimî? Dinya giştî di destê te de ye, û tu li koşka xwe di bin çavêñ noke-rêñ xwe de parêziyê de radikevî. De bibêje, çima tu diqêri.

Zehak bersivand:

-Divê xewna min ji kesî re neyê gotin. Heger te bizanibiwa xewna min çawa bû, dê tu jî, ji bo jiyanâ min bitirsiyayî.

Arnavaz got:

-Heger tu xewna xwe eskere bikî, dibe ku em bikaribin ji wê şiretek derxînin. Tu gelş û pirsgirêkek tune ku neyê çareser kirin.

Wê çaxê Zehak xewna xwe ji wan re vekir. Jina wî ew da sekînandin û got:

-Tu nikarî xewna xwe piçûk bi-bînî! Ew nîşana pir tiştan e. Li ser gerdûnê çiqas mirovîn zana û xwedî kerametê hene bîne ba hev. Bila derxînin holê ka ew kî ye te ditirsîne.

Fermandar di koşka xwe de hemû mirovîn zana û xwedî keramet anîn ser hev, û ji wan re derd û kulêñ xwe rîz kirin û ji

wan şîrêtan xwestin. Rûyên mirovên xwedî kerametê gewr bû û bû qîr-qîra wan. Ji ber ku wan nexwest ji padışah re bibêjin ka çi bi serê wan ve hatiye. Roja çaran Zehak cardin ew civandin, û bi hêrs ji wan pirsî ka çima wan ji wî rastî veşartin.

Gîş fikirîn, lê di dawiyê de yê herî zana derket holê û got:

-Tu kesek bê mirin nayê dinê. Yê ku dibe, dimre jî. Berê te jî, gelek padışahêن xwedî rûmet û bi hêz hebûn. Dema roja wan hat ew jî, yek bi yek mirin. Wê hin kes werin. Zora te bibin û tacâ te jî, ji wan re mirat bimîne. Navê wî Ferîdun e, lê ew hê ji diya xwe nebûye. Hêj ne hewce ye ku tu ji wî bitirsî.

Zehak pirsî:

-Çima ew ji min binefirî? Ji ber ku tu bavê wî dikûjî. Zehak qederek ramî û mirovên xwe şandin li du şopa Ferîdun. Zehak ji tırsê nedikaribû bîhna xwe bigre, rakeve û xwarinê bixwe. Demek weha domkir. Ferîdun ji diya xwe bû. Hebûna Ferîdun bû dest pê kirina guherîna gerdûnê. Ferîdun mezin bû û bû xortekî ciwan û zebaleh. Zehak li her derê li dû wî û bavê wî, Abdîn geriya. Abdîn Koçkir, lê di dawiyê de hat girtin û kuştin.

Di vê demê de Ferîdûn li ba diya xwe, Faranak, di pareziyê de bû. Zehak her ku diçû di jiyanêke tırsîn de dijiya. Lê, ser vê yekê wî rojek bang li aqilmendêن xwe kir û ji wan re got:

- Ez xwedî dijmînekî veşartî me, û herçend dijminen min sivik in jî, ez ji wan giştan ditirsim. Ez ditirsim ku dilgesiyê ez berdame. Divê ez artêsa xwe bixurtînim, û divê hûn jî, daxuyaniyek binivîsin û tê de bidin nîşan ku

min bi tenê karêñ rind kirine û min tu car bê rastiyê gotinêñ din negotine û tu car nebûme alîgirê bêmafîyê.

Aqilmendêñ wî gotinêñ wî gişt nivîsandin.

Wan ji nişke ve li derê koşkê dengeke bilind bîhîstîn ku ji bo mafdarîyê diqêriya. Padışah ew mirovan anî ba xwe û jê pirsî ka kê bêdadî li wî kiriye.

- Te kiriye, padışahê min, bersivand mirov.

- Ez xwediyyê hevdeh lawikan bûm û niha tenê yek lawê min heye. Ez hêsinkarekî bêgune me. Min tu car çewtiyek nekiriye. Ez di bextê te de me ku tu lawikê min berdi.

Padışah, lawê wî berda û xwest ku bi gotinan kêfxweş bi ke. Di dawiyê de jî, ji wî xwest ku binê daxuyaniyê, ku aqilmendan nivîsandibû, îmze bike. Lê, hesinkar, ku ji hîrsan dileriziya, kaxiz çîrand û di bin lingêñ xwe de helisand.

### Hatina Ferîdun

Dema Zehak bi cihê, ku Ferîdun xwe tê de veşartibû, hesiya bi artêsa xwe, ku ji hevalên wî pêk dihat, çû li wir. Ferîdun êdî zeman nedît ku bifikire. Rabû û çek û rextêñ xwe girêdan. Li hewşa mala xwe artêsa xwe civand. Dema gîhiştin çemê Dîclê û bajarê Bexdayê, Ferîdun keştiyek xwest da ku bikaribin bi wê derbasî wê aliyê çemê bibin. Lê, nobedar got, padışah ferman daye ku tu kesek nikare bê destûra wî derbasî wê alî bibe.

Dema Ferîdun ev bîhîst, hêrs bû û raste rast hespê xwe ajot nav çemê û mirovên wî jî dan li dû wî. Deh ferseh mabû ku ew

bigêhin bajarê, koşka Zahak dîtin. Wan ew di cih de naskir, lewre ew pir mezin bû. Ferîdun vege riya ser artêsa xwe û got:

- Ev koşka ku em dibînin, di de xuyakirin ku dijminê me dijmi nekî mîrxas e. Lê, êdî felat tune, baştir e ku em dest bi têkoşînê bikin. Em nikarin bi hiziriyê zeman derbas bikin.

Wî çakuçê xwe rakir û li hespê xwe xist, nobedarê koşkê li pey xwe hiştin û ket hundirê koşkê. Ferîdun peyivdarê ku Zehak ji bo parastina xwe ya li dijî Ferîdun bi cih kiribû, perçiqand û ket oda Zehak û tacâ wî da se-re xwe.

Nokerekî Zehak ew agahdar kir ku sê mîr hatine û ew dimînîn mîrêñ ku wî di xewna xwe de dîtîbûn. Zehak lez kir artêsa xwe şand ser koşkê. Lê, mirovên Ferîdûn û şêwiyan bajarê bi hev re rîz girtin û li hemberî artêse wek ciyayeke zexm şer kirin. Di germiya şerê de Zehak xwe di kincên şerê de veşart û nema kesek ew bidîta ket hundirê koşkê. Lê gelek zeman derbas nebû, ew hat naskirin. Ji bo vê yekê jî, mecbûr ma xwe ji hêla paş ve avêt jêr. Ferîdun wek bahozekê dijwar li wir bû û bi qameya xwe derbêñ xedar li Zehak xistin. Lê nokerekî Zehak bi bawerî ket bextê Ferîdûnê ku ew Zehak nekkûje, lê wî bişîne ciheke ku kesek wî nabîne. Li wir Zehak heta-ku bimra, dikare bimîne.

Feridun destêñ Zehak bi kelapçê, lingêñ wî jî bi qeydan wer girêdan ku êdî filekî kûvî jî, nikaribû wan veke. Wî bir li serî ciyayekî bilind girêda. Li wir Zehak jiya, heta ku ew xirabiyêñ ku wî kiribûn bi tevayî ji holê rabûn û gerdûn ji qirêjiyê filiti.

# SIYASET Û

KONAKBİRİN

## KURD

Cemil GÜNDÖĞAN

Heta niha li ser rewşa ronakbîrên Kurd lêkolîneke têkûz nehatiye çêkirin. Em hê baş nizanîn ku gelo rewşenbîrên Kurd, bi zêdahî ji kîjan grûbêñ civatê pêktên. Gelo ronakbîrên Kurd, bi kîjan awayî diponijin? Gelo pêşveçûna fîkrîna ronakbîrên me heta îro bi ci awayî meşiyaye û îro bi ci awayî dimeş? Hizirker (düşünür) ên ku ronakbîrên Kurd ketîne bin bandora wan, kî ne? Û ya herî girîng, gelo ronakbîrên Kurd, îro li ser têkoşîna neteweyî ci difikirin? Alikariya wan a bi têkoşîna germ a iroyîn re heye an na? Ku heye, bi ci awayî dimeş? hwd.

Mirov dikare hejmara van pirsan zêde bike. Lê belê ji ber tunebûna lêkolîneke têkûz, bersivêñ wan pirsan ên berfireh heta niha bi layîqa xwe nehatine danîn. Ew, wek peywîreke girîng li ber me disekine.

A yekemîn, em dixwazin vê rewşa ecêb ku me li jor qal kir, bînin rojêvê û ronakbîrên Kurd

vexwînin (dawet bikin) ser peywiра xwe. Ji ber ku, ronakbîrên ku hê rewşa xwe rind nizanîn, nikarin li ser rewşa welêt û civata xwe jî bifikirin, û herweha nikarin vê rewşê biguherînin jî.

Armanca me ya diwemîn ew e ku, li ser hin wecheyên têkiliyên navbera ronakbîrên Kurd û siyasetê bisekinin.

Di vê niqtê de, berî her tiştî, divê em li ser kategoriya "ronakbîrên Kurd" lê hûr bibin. Gelo mîr û jînêñ Kurd ên ku di nav vê kategoriyyê de têñ hesibîn, çiqas homojen in?

Gava ku em li bersîva vê pir-sê bigerin, emê bibînin ku ronakbîrên Kurd ne mîna hev in; wek ronakbîrên welatêñ din, celeb-celeb in. Cudatiya ku di navbera wan de heye, car bi car digihê radeyekî mezintirîn.

Ji bo mînak: hinek ronakbîr henin ku, heta ji destê wan tê, piştgiriya têkoşîna germ dîkin û hewl didin xwe ku vê têkoşînê di warê entellektuelî de jî xurtir bi-

kin.

Ronakbîrên ku tengdîtwer (ne dûrbîn) in û girêdayîyê rêkxistînek an jî tevgerekê ne, grûbek pêk tînin. Ev grûba han, berjewendiyêñ (menfaat) rêkxistîni an ên tevgera xwe, ji her tiştî bilintir dibîne. Li ba wan rastiyêñ çînî, cîvâñ û dîrokî pir caran piştî berjewendiyêñ teng yên rêkxistîn û tevgerêñ wan tê.

Her weha grûbekî din heye; ronakbîrên ku di nav vê grûbê de cih digrin, bi awayekî bazîrganî li têkoşîna neteweyî mîze dîkin. Anglo, ew bi xwe nekevin nav têkoşînê, jê dûr disekinin û keys digerin û gava ku fersendek derkeve holê, hewl didin û gava ku fersend ji bo berjewendiyêñ xwe yên kesanî bikarbînin.

Grûbeke din jî heye, ji kesen ku bi tu rêkxistin an tevgerek ve girêdayî nîn in û bi gelemperi rêkxistînê ji bo azadiya xwe ya kesanî wek qeydekî dibînin, pêk tê. Hinek ji endamên vê grûbê dibêjin, "siyaset ne karê ronakbî-

ran e; siyaset, karê siyasetvanan e'. Ji ber vê yekê jî, divê ronakbîrên Kurd qet têkilî têkoşîna germ nebin, ji xwe re di warê zanistî û entellektuelî de bixebitîn".

Herwekî tevayıya ronakbîrên Kurd ewqas nîn in; hin grûbêñ din jî hene. Lê belê, wek ku me li jor got, em nikarin di vê nivîsa-ra kurteberî de hemû grûbêñ ronakbîr ên Kurd ji her aliye ve nîşan bidin. Ev karê han, karekî cu-da ye û divê bi layîqa xwe bê çareser kirin. Em dixwazin li vir-tenê li ser hin taybetî û nêrînêñ du grûbêñ dawîn bisekinin.

Ne hewce ye ku em li ser grûba ku bi awayekî bazirganî têkilî têkoşîna neteweyî dibe, zêde tişt bibêjin. Rewşa endamêñ vê grûbê eşkere ye: şerpeze bûne, di nav xeyalan de digerin.

Endamêñ vê grûbê, bi piranî ji komelêñ berê, yên ku ji xwe re 'sosyalîst' digotin, têñ. Wek tê za-nîn, berê sosyalizm tiştekî moda bû û ji ber vê yekê jî, mirov dikaribû bi vê fikrê li derdora xwe bandorekî damezirîne. Şerpeze-yen îroyîn, ji duh, ji ber vê se-demê bûn "sosyalîst"! Lê, wexta ku 12'ê ïlonê hat û sosyalîstbûn, bû tiştekî bi xeter, û pişt re jî sîs-tema Sovyet hilweişîya, êdî tu ce-zîbeya sosyalîstbûnê nema. Di gel vî 'sosyalîst' ên me yên sexte, hêdî hêdî dev ji sosyalîzmê ber-dan û pêşî bûn demokrat, pişt re jî liberal.

Ev liberalêñ teze, iro riya xwe ji binî ve winda kirine û nizanin li ser kîjan şopê bimeşin.

Ji xwe re dibêjin "ronakbîr", lê belê naxwînin. Bi nezaniya xwe li derdora xwe digerin. Herweha nanivîsin jî. Ji ber ku nafikirin. Derfetêñ ku di bin destê wan de-ne, ji bo çareserkirina pirsgirê-

kên welêt bi kar naynin. Carek dîbin şoreshger, demokrat û welat-parêz ên çalak(!), dertêñ meydan-an, fort didin xwe, tu dibêjî, qey ew dê niha cîhan ser û bin bikin; carek jî dîbin mîskînêñ xwenezan, dikevin quncikêñ xwe yên tarî.

Ji bo mînak: wexta ku hilbijartîn hat, dîbin şoreshgerekî xurt(!), û bi vî awayî dixwazin potansiyela têkoşîna neteweyî ji bo berjewendiyêñ xwe yên kesanî (şexsî) bikarbînin û bibin mebûsekî an serokekî belediyê. Ji bo vê ar-mancê nêzîkî hêzên şoreshger di-bin; her yekî xwe wek "mîlitane-ki" xurt nîşan didin; û dixwazin xelqê bixapînin.

Lê hemu derew in. Li dû hilbijartînê, her tişt diqede. Yên ku têñ bijartin, diçin di meqamê xwe yên nû de rûdinin. Yên ku nikarin serbîkevin, dîsa dizivirin qûncikêñ xwe yên araqîn, ji sibê heta nîvê şevê vedixwin û di nav-bera xwe de pirsgûhezî (pirbêjî) dikin. Wexta ku ji araqê keysek bibînin, serê xwe radikin û ji xwe dipirsin: Gelo em çawa biserke-vin? Vê gavê çavêñ xwe dizivirîn ser girêgirêñ komara Tirk, xâsimâ li ser serekomarê: Gelo iro dewleta Tirk rûyê xwe nazivirîne vê aliye, ji me re keysekî legal dernakeve holê? Û dest bi propa-gandaya giregirêñ komarê, xasi-ma propaganda Ozal dikin.

Lê têkoşîna germ, hiş li serê dewletê nehiştiye ku dewlet riye-ke bi rûmet(!) ji "ronakbîr" ên me re veke!!! Berevajî vê yekê tero-ra dewletê her ku diçe xurt dibe û ji bo reforman derfetek namî-ne.

Û bi vî awayî "sosyalîst" ên me yên kevin dibînin ku di wî warî de jî, hêviyeke mezin nemaye, vê-ca rûyê xwe dizivirînin giregirêñ

Emerîka û Ewrûpayê: Gelo se-rokêñ dewletêñ mezin nikarin ji me re dewletek ava bikin, an jî zor bidin giregirêñ Tirk, da ku riya reforman ji me re vekin? Û bi vê hêviyê dest bi propaganda-ya Bush û Clinton dikin.

Di nav wan de yên herî şerpe-ze, her roj xeyala têkçûna PKKê dibînin, wexta ku dewlet êrîşekî mezin bi ser gerîla ve dibe an jî haziriya vî karî dike, şerpezyêñ me dikevin nav hêviyeke qirêj û di dilê xwe de dibêjin, "cara ewil nebû, însallah vê carê wê bibe. Ku dewlet nikaribe gerîla û PKK ji holê rake jî, qet nebe bandora wê dişikîne û bi vî awayî meydan ji bo me wê firehtir bibe".

Bi kurtahî, ev cure "ronakbîr" ên Kurd, di rastiya xwe de, ne ronakbîr in; tenê bazirganêñ siyasetê ne. Anglo ji siyasetê dûr nîn in; lê belê li ser şopeke qirêj dimeşin.

Li berevajîyê van bazirganêñ siyasetê, ronakbîrêñ me, yên ku xwe ne siyasetvan dihesibînin cih digrin. Wek ku me li jor qal kir, hînek ronakbîrêñ me jî, ji peyva "politîka" yê qet hez nakin; li her derê û di her keysê de dijîtiya xwe ya siyasetê tînin zimêñ û dibêjin, "siyaset ne karê ronakbîr-an e; ev mijûliyeke siyasetvanan e. Ronakbîr, divê bi karê entel-lektuelî re mijûl bibin".

Li ba wan siyaset, berî her tiştî, rêkxistin divê; û rêkxistin li ber azadiya ramanê qeydeki (pranga) mezin pêktîne. Lewra, rêkxistin destûr nade ku mirov bi awayekî azad biponije (bifikire) û fikrêñ cuda pêk bîne û, hwd.

Gelo ev dîtinêñ han rast in an na? Anglo li welatê me siyaset û şixulê entellektuelî çiqas ji hev dûr in? Û, rêkxistin bi rastî jî, li

ber azadiya raman astengekî mezin pêk tîne an na? Em dixwazin hinek li ser van pirsan bisekinin.

Rast e, li welatê me, têkiliyên di navbera rêkxistin û azadiya raman de çewt hatine fêhm kirin û tetbiq kirin. Xasima di dema borî de, di nav rêkxistinan de fikrîn cuda nekarîne xwe bi hêsanî ifade bikin. Gava ku yekî fikrekî cuda anije ziman, bi zû ji rêkxitina xwe hatiye avêtin. Belê, di qada teorî de her rêkxistinekî behsa demokrasiyekî berfireh a hundirîn kiriye, lê belê di qada praktîkê de rewş cuda meşiyaye. Bi rastî, iro jî rewş zêde neguhe-riye.

Ev giş rastiyên me ne. Hin ronakbîrên me vê rewşê xirabtir dibînin û dibêjin: "cihê ku rêkxistin tê de ye, li wir azadiya raman tuneye".

Lê belê, ev nêrîna han, ne rast e. Ji ber ku sedemên serekî yêñ tehamul-nekirina fîkrîn cuda, çavkaniyên xwe ji paşvemayîna civata me digrin. Ji ber vê yekî jî, ne tenê di nav rêkxistinan de, herwekî di nav kesan de jî, tehamul-kirina fîkrîn cuda kêm e. Divê em xwe nexapînin; yêñ ku herî zêde giliya tunebûna azadiya ramanê dikin, da ku carek li xwe mîze bikin, ew dê bibînin ku ev tahamul-nekirina han, di nav dilê wan de jî heye.

Ji ber vê yekî, divê di vî warî de jî, em kîmasiyên rêkxistinan bibînin û li dijî wan têkoşîn bikin; lê belê, ji bo tunebûna azadiya ramanê, divê em tenê rêkxistinan tawanbar nekin.

Li ser vê babetê evqas bes e. Niha em dixwazin werin li ser pîrsa yekemîn; angó, li ser teza ku dibêje: "siyaset û şixulê entellektuelî karên cuda ne; ji ber

vê yekî jî, divê ronakbîr têkilî karê siyâsî nebin, ji ber ku siyaset karê siyasetvanan e".

Gava mirov bala xwe baş nedê, ev nêrîna ha wek tiştekî rast dixwiyyê. Ji ber vê yekî: Mirov difikire ku, hemin siyaset û karê entellektuelî tiştên cuda cuda ne, divê xwedîyên van karan jî, cuda cuda bin.

Lê belê, di rastiya xwe de rewş ne weha ye. Xasima li welatênu ku wek me bindest in, karê siyâsî û yê entellektuelî ji welatênu din zêdetir bi hev ve girêdayî ne. Mirov nikare bi hêsanî ev karan ji hev biqetîne.

Du sedemên serekî yêñ vê rewşa han ev in:

A yekemîn, tê-nav-ketina siyaset û şixulê entellektuelî ye. Herçiqas polîtîka û şixulê entellektuelî bi serê xwe, ji hev cuda bin jî, di navbera wan de têkiliyekî herî nêzîk heye. Ji ber ku, ji aliyeke, siyaset bi xwe mijareke zanyarî ye, li ser bingehêke zanistî pêşve diçe; ji aliyeke din jî, siyaset, bi qadêñ din ên zanyarî ve, ji nêzîk ve girêdayî ye.

Her kes dizane, siyaseta ku li ser metodêni ji bav û kalan derbasî me bûyî dimeşe, ne nûjen (modern) e. Siyaseta wilo, di paş de ma. Polîtîkaya iroyîn li ser metodêni nûjen dimeşe û ev pêwîstîya han rengekî zanistî dide siyasetê. Ji bo mînak: da ku civaknasî, statîstîk, dadgerî (hukuk), demografi, psîkolojî û hwd. nebûya, siyaseta iroyîn dikaribû pêşve biçûya? Ji ber ku polîtîka, bi her awayî, alîkariyeke mezin ji van qadêñ zanyarî stendiye û iro jî distîne.

Yêñ ku dibêjin, "polîtîka û karê entellektuelî tiştên cuda cuda ne", berî her tiştî vê rastiyê

naynîn ber çavêñ xwe. Ew tenê li polîtîkaya Kurdan a iroyîn mîze dikin û digîhêjin dawîneke çewt. Ji ber ku polîtîkaya Kurdan a iroyîn, bi rastî jî, hê li ser bingehêke nûjen nameşe; Kurd, bi piranî, siyaseta xwe, wek karênu xwe yên din, bi awayekî ku ji pîr û kalan derbasî me bûyî, didomînin. Ü ji bo ev siyaseta ha zanistî pir hewce nîn e. Ji ber ku di vî warî de her tişt bi awayekî destlep di-meşe.

Hinek ronakbîrên me li vê rewşa xirab mîze dikin û dibêjin, "bila polîtîka ya siyasetvanan be, kar û barêñ entellektuelî ji me re bes in". Ango, çewt lê mîze dikin û digîhêjin dawîyeke çewt. Herweha, divê têkiliya wan herduyan ji berevajî bêñ çêkirin. Ango, divê ronakbîrên me bibêjin: "hemin ku polîtîkaya Kurdan a iroyîn li ser awayekî nûjen nameşe, divê em ronakbîr, angó yên ku xwedîyê zanist in, têkilî vî karî bibin û metodêni zanistî bigîhîn politîkaya Kurdan. Da ku polîtîkaya Kurdan bi her alî ve bigîhêje qonaxeke nûjen.

A diwemîn paşvemayîna civatê bi xwe ye. Wek ku me li jor got, di welatêni paşvemayî de, mirovên ku koletiya civata xwe herî ewil dibînin, di eynî wextê de ew in ku li dijî vê koletiyê têkoşîn di-din. Ango, di van welatan de paşvemayîna civakê destûr nedaye, ku ji "çîna entellektuelî" pê ve "çî-neke siyasetvanan" jî pêkbê. Ev herdu çîn, xasima di despêkê de, ji eynî mirovan pêk tê. Tu şik nîn e ku ji bo welatê me jî, rewş welê ye.

Dîsa, di welatêni paşvemayî de kar û barêñ entellektuelî nikarin bi hêsanî bi serê xwe bimeşin. Ji ber ku astengêñ (engel) si-

yasî, di her gavê de li ber vê şixulê radiwestin.

Çima?

Ji ber ku civat azad nîn e û warê zanyarî jî, ji vê tunebûna azadiyê para xwe distîne. Astengên siyasi, çeperên xwe yên zexm li dora şixulê entellektuelî jî didorînin. Ji ber vê yekê jî, yên ku dixwazin şixulê entellektuelî bikin, berî her tiştî divê li dijî astengên siyasi rawestin, ango têkoşîna siyasi bidin.

Faktorê ki vêsey yan zî toyey-dey qalinî sero tesîr kerdinî zaf bî. Qorê mar û pîrân waştinî key-narda xwe rî zaf cêz bikî, ayay se-ro zaf qalin girewtinî. Tayn may û pî feqîrî bî, idarey nîbînî, aw semed ra vêşî qalin girewtinî. Keyneka ki Pîran ra bişînî de-wan, qalin yay tim vêşî bi. Keyneka ki bişînî weşnî ser qalinî yay vêşî bî. Çaxo ki polê keyneke nî-waştinî keyneray xwe bidî qalin zaf waştinî. Eke keyneki biamey-nî remnayış yan zî ya bi xwe ye-terî rey bikewtinî, qalinî yay vêşî binî. Eke piyê keyneke pêt bi-bînî, namedar û vengandaye bîbînî yan zi yew keyewo pîl ra bîbînî; keyneke bi qalinê tayn reyra nîdaynî. Qalin yew hetî rî presti-jê mar û pîrdê keyneki rî yew krîter bî; heto binî ra, qedr û qiyemetê keyneke zî bîney pabeştey qalinî yay bi. Keyneka ki qalinî yay zaf kêm bîbînî, nîbaya hesebaynî.

Helbet gelek sebebê tayn qa-lingirewtişî zî bînî ki polê lacekî û keyneki bi zeriba safî biwaşti-nî, tê reyra mîrdimey bikî, qalin

nêbinî yew problemdo gird. Hetta weziyetdo anasarê de polê keyneki kîsedê xwe ro naynî ser. Wexto ki lacek û keyneke zaf mîrdimê yewbînanê nîzdî bibînî, (datiza - datkeyna), qalin kêmî gîraynî. Debarey lacekî zaf rind bibînî, polê keyneki zaf dozey qalinî nêkerdenî. Yew nisxoney keyneke bibînî, qalinê yay zaf nêbînî. Gege zî may û pî keyneke nêwaştinî, zama rê xwe finî tengane qalin vêşî nêgirewtinî. Eke ve-yeke şarê dewan bibînî, qalinê yay kêmî bînî. Keyneka qart a keye de menda zî, nêbînî wayirê qalinê vêşî.

Labelê, vêşî yan zî kêmî, herkesi qalin girewtinî. Vîst yan zî vîst panc serrî ra ver, qalino ên vêşî hewt ya zî des hezarî bî. Qalino normal hêrê - çehêr hezarî bî. Qalino tayn beyntarê hezar û di hezarî de bî.

Dayışê qalinî zî, ebe gore bê weziyetdê poldê zamay bedeliyaynî (vuriyaynî). Eke qewetê polê lacekî bibînî, şewa ki qalin birnaynî hema a şewe qalinê xwe daynî. Ebe gore bê zanayısdê mi, çewerî qalin heze ki yew çî biherîno, perey nêwomaritinî û nêdaynî pêrdê keyneke. Perey qalinî zafiney poldê lacekî ra yewî de-kardinî bindê doşekdê pêrdê keyneke. Eke debarey lacekî rind nêbinî, ay wext ya lacek şînî xebatî ya zî cay malê xwe rotinî û qalinê xwe daynî. Gege polê lacekî qalin deyn kerdinî û daynî. Çunkî "qalinî ver de mendîş" çido weşnêbi.

Qiymetê qalinî tim peran reyra beylu kerdinî. Labelê gege he-rundey peran de, polê lacekî şiyaynî yew hêga, bostan, çend de-warî, tifing yan zî sewbî çî bido pêrdê keyneke. Na mesela hinî

pabestey pêameyişdê polê lacekî û keyneke bî.

### Nîşan Beylukerdîş

Meselâ nîşanî hina asan bî. Çunkî nîşan akeyreynî keydê lacekî. Ay wext yew nîşano normal ya 5 hebî altûnê wîrdêkî (yuzlig), ya zî 2-3 hebî bîlî bî. Nînan ra teber yew helqa, yew citay goşaran û yew îngîştîri zî, nîşanî de bî. Mesela nîşanî sero yew seremonîdo xususî nêkerdinî. Ma vacê, helqay zamay û veyeke nêkerdinî yînî gîştî. Heta heyânî nê se-ranê peyenan, polê keyneki za-may rî helqa nêrinaynî. Zafiney zamayan zî bê helqa bî. Keyneke zî helqay xwe roca ki derî biberdi-nî kerdinî îngîsta xwe. Labelê herkesi ganî nîşan bironaynî.

Gilangan polê zamay, qewetê yînî ser bêresaynî ki nîşan bieri-nî, şînî yew mîrdimdê xwe ra qard kerdinî û berdinî nîşanê xwe ronaynî. Na ray wexto ki ve-yekey xwe ardinî, nîşanê şarî ber-dinî tepa daynî yînî. Girweyê ana-sarê gege beyntardê lacekî û keyneke de bînî sebebê caley û xi-rebey.

### Şîrine Werdiş

Zafiney şîrine qalin birnayışê ra pey weriyaynî; labelê qorînan şîriney xwe verê qalınbirnayışê werdinî.

Polê lacekî ebe gore bê xwe veyndey 30-40 canêrdan daynî. Camêrdî heme ameynî key lacekî di pêser bînî. Polê keyneki zî veynedey mîrdiman û cîranandê xwe daynî. Tim û tim mîrdimî ki polê lacekî veyndaynî, ey poldê keyneke ra vêşer bî. Polê lacekî heme merhale û warandê zewaci de poldê keyneke ra aktifêr bî. Heze ki lacek tenya bizeweco. Polê keyneke tenya semedo ki edat bî, veyndey şarî daynî ya zî

sewbî girwey kerdinî. Heta mar û pêre keyneke zaf dîqet kerdinî ki wa şar nêveyno yê bidayîş keyna şad biyî yan zî keyfî yînî yeno. Helbet pîzedê xwe de şiyay-nî keyf bikî û zafinî zî kerdinî. Labelê ganî keyfî xwe şarî nêna-witînî. Çunkî eyb bî.

Ne poldê lacekî ra û ne zî poldê keyneki ra cenî nêşînî şîri-ne. Camerdê polê zamay key pêrdê lacekî de pêser bînî û wexto ki binî nîzdî eşay heme tê rey-ra bî, di-hîre likusan reyra (ay wext ceryan newe amebo Pîran û tenya bînandê hikumatî de bî), şî-nî keydê keyneke. Camerdê pol-dê keyneke xwe ra key keyneke de roniştey be. Ebe enhewa zî kê zanaynî kam kişte veyndey kamî dawo. Hetanî peyniyey şîrînî liku-sî key pêrdê keyneke de paneyey mendinî. Zaf hewe ebe şeqwê li-kusan Pîranijan zanaynî, key kamî de şîrîne werêno ya zî hene wo.

Eke kê weşey ya zî nêweşey, vêşey ya zî toyey berzî yew kişte, şîrîne hema hema timi bastêx, dendikê gozan û voman bî. Yew şerbet zî virastinî.

### Patîrey

Şîrine werdişê ra pey cenî şînî patîran. Patîrey tenya qaydê cen-iyan rî bî. Hezey şîrinî hewna wir-dî polan zî veyndey mîrdiman û der û cîrananê xwe daynî. Edet bî, camêrdî ke şîyî şîrine, cenî yînî zî şanî patîrey. Patîrey taşttere re pey weriyaynî. Hezey şîrinî, ce-niyê ki polê lacekî veyndaynî, şî-nî keydê lacekî û weyre ra pêrû tê reyra şînî keydê pêrdê keyneke.

Polê keyneke ay roj tedarikê xwe dînî. Çend tewirî wer hadire kerdinî. Werê ki ay roj hadire bî-nî, biney ciydê xamî bî. Mesrefê patîran mar û pêrî keyneke ker-

dinî. Werê ki ay roj pewjaynî zafîney nê bî: *Patîrey, zerbetî, dolmey, pendaritî, gudikî, riz* û eke amna-no, *tirşey tarî bi goşt*, heke zimis-tan o *tirşey feslan bi goşt* û sewbî gelek çî pewtinî. Nanê patîran zî beskemati bî. Wedewo ki cenî te de ronîştinî, cora bi cêr izarî ra-kardinî û wer izaran sero rêz ker-dinî. Ceniyân heminî tê reyra nanê xwe werdinî û terqnaynî. Ti-ra pey veyeke bi yew qatê cilan-dê zaf weşan womeynî zere û lew destê heminî ra daynî.

Dima yew cenîya biney kamilî û wayirê tecruban yew purcine gi-rewtinî û dest bi arêkerdişê per-an û xelayan kerdinî. Ceniyê ki ameynî patiran tedarikê xwe dî-nî. Hergû cenî ganî tayn çî bieşti-nî purcine zere. Zafiney perey bî, labelê gege tayn ceniyân he-rûndey peran de sewbî çî defistinî patiran. Arêkerdoxî yew bi yew heme ceniyân vera viyartinî. Kam cenî çî bidaynî arekordoxe bi name bê jay reyra çî yay zî bi vengdê berzî reyde eşkere kerdinî. Mêrdimanê lacekî û keyneki yê nizdiyan zaf perey defistinî pa-tiran. Qewetê yînî ser biresay-nî-nîresaynî ganî bikerdinî. Ma-rey lacekî perey nêdefistinî patîran. Yay "boxçe" berdini. Boxçe de yew fistano zaf giran, yew fistano normal, di citey pirênbazî, di pirêni, di citey sewlî, di citey kurikî, mexmelî û qintî bî.

Arêkerdoxe wexto ki girwey xwe qedênaynî, cemati miyan de perey û xelâye ke ameyî pêser he-me womartinî û neticey yînî cer-nan ra vatinî. Ci pere û ci ay çidê bînî heme teslîmê mardey keyne-ke bînî. Marey keyneke zî bi nê peran teyra keynardey xwe rî yew çido zerên erînaynî. Herçî polê keyneki têkilê perandê patî-

ran nêbinî. Eke keyneke rî cay çî nêgirewtinî, ay çax perey daynî keyneke û keyneke zî wexto ki bî-nî veyeke nê petey xwe reyra ber-dinî key mîrdedê xwe.

Ay wext normal 300-400 pox-notî dekewtinî patiran. Helbet hezey heme guran pêtey yan zî feqirey lacekî û keyneke na me-sela ser o zî tesîr kerdinî.

### Cêz Girewtiş

Wexto ki polê lacekî qalinê xwe pêrû daynî, polê keyneki şî-nî cêz girewtinî. Hergû keyneka ki bînî 13-14 sera, dest bi cézdê xwe kerdinî. Xwe ver de keynan dest bi viraştişê tentenan, muran û tewir neqîşan kerdinî. Hema, çiyo ki viraştinî qaydê keydê xwe rî hewenaynî. Bêgûman maran zî waştinî yînî xwe rî cêz bikî. Heta bînî ra keyneya ki nêzanaynî ne-qîş bika muran viraza, bêhuner hesebaynî. Aw semed ra maran keyney xwe teşwiq kerdinî û derî qenafça, la, çongal û sewbî çiyê ki lazim bî erînaynî. Ez vana qey hema, hema keynanê Pîranî zaf yan zî tayn zanaynî nê guran bi-kî. Danî bizanaynî, nêzanayış eyb bî.

Ebe enhewa cêzo verê çaxo ki keyna hema 13-14 sere ya ameynî pêser. Tayn maran hesabê key-nardey xwe zaf rew kerdinî. Se-nedê yew rojdê anaseranî şînî keydey keyneke ra dest bi erînayışê fistanan, mexmelan û sewbî çidê piragirewtişî kerdinî. Bêxer-bey keynardê zaf zaf feqîran, hergû keyneke çaxo ki hînî bînî 13-14 serra zaf tayn wayirê cêzî bî.

Labelê zafiney cêzî wexto ki polê qalinê xwe heme daynî ameynî girewtiş. Gelek may û pî semedê cêzî girewtişî şînî Diyarbekîr. Taynan zî Pîran de cêz erînaynî. Aynan ki Pîran de cêz gi-

rewtinî, ganî şew bişînî çarşû û kel-melo ki dey rî lazim bî, bierî-naynî. Çunki cêz zafiney ceniyân girewtinî û semede ki Pîran di roj çarşû şiyâyişê ceniyân eyb bî, mecburî ganî şew bişînî.

Çiyê ki keyneki rî heze cêz gê-raynî, zaf-tayn nêbî. Yew qutî, yew lîlik, sere û pay ra çend qatî cili. Yew ya zî di çarçefê piragi-rewtişî, en tayn di citey sewlî. Yew şinewo kateyên û yew da-rêن, çend qalibî sabun, darzin û layê deyştenî, yew fomlewo rês-en û yew zî naylon ya zî dese-kên, yew-di citey terlikî, en tayn şes namilkî û uskurey sîfrîn, şes kuçik, yew sînî, yew tebaxça, yew qefes (semedê mexmelan û tef û talo wîrdî) û yew qatê nivînî (peşmîn ya zî pemeyen). Zamay rî yew qatê cilan, mar û pêrdê za-may rî û eke estî, war û biraran-dê zamay rî yew işlig, fistan yan zî sewbî çî. Heme kesikî ameybî şîrîne, heminî rî yew xelâya sivi-ke.

Texminên serandê 1930-40 de cêzê veyyekan hem hina tayn û hem zî zaf ciya bi. Herundey tentene, muran û neqîşan de veyyekan, arûzî, kurikî, kîsey peran û sewbî çî viraştinî. Qoncixey û wesarê estoran û qatiran heze xela daynî. Ay wext fesb û şerî, mundî û qolî (qedifey), û mosil-bêzî ra cilê sipî yê neqeşnayey cêzê keynan bi. Ayê ki pêt bî 3-4 qolê yînî bî, feqîrî zî wayirî 1-2 qolan bî. Qolê qedifey pey ladê ibrisîmî derzaynî û sêm zî var naynî.

### Şewey Henî

Roja ki veyeke hewelnaynî, yew şewe tira ver veyeke û zama hene kerdinî. Hem poldê lacekî ra û hem zî poldê keyneke ra ce-niyê ki şîbî patiran şînî veyeke

hene kerdinî. Şewey henî zî, key keyneke de bînî. Mêrdimanê ve yeke verê veyeke zaf weş xemel-naynî, cilê yayê tewr weşî pira-daynî û hene elawitinî û dest-duyes gudîkî viraştinî. Ehendey zî mûmî gudikandê henî ro cenaynî û hergû godikey henî dekerdinî yew namilkî. Wexto cenî pêro ameynî pêser, veyeke ardinî werteypedî de yew kursî sero roşay-naynî. Mumê xwe pa naynî û çend ceniyan namilkiyê ki mûmî tedit bî, girewtinî û nor û dorey veyeke ro şînî û ameynî. Deyirî kerdinî û govend girewtinî. Ceniyanê bînan zî hetanî ki mûmî veşaynî û qediyaynî, govend girewtinî. Ay beyntar de çend ceniyan dest û ningê veyeke hene kerdinî.

Henekerdişê veyeke ra pey, eynî hezey patiran, yew cenî pircunî girewtinî û şînî ceniyan vera geyraynî. Hergû cenî gorê bê qeweta xwe perey eyştinî pircunî zere. Arekerdoxî kam cenî çendeyî perey eyştinî percunî zere, veng-dê berz reyra vatinî. Pereyê ki dekewtinî hene, arekerdoxî cematî miyan de omartinî û yekûn-nê yînî cemati rî vatinî. Perey tes-lîmê mardey veyeke kerdinî. Perey henî zî, perey veyeke bî û xwe reyra berdinî keydê mérde-dê xwe. Pereyê ki dekewtinî he-ne, tim û tim ey patiran ra toyêr bî.

A şew, yew gudey henî zî yew mîrdimê zamay key veyeke ra berdinî, keydê zamay û destê za-may zî hene kerdinî. Polê keyneke ganî hesabê şardê henî biker-dinî. Edet bî, ceniye ki şînî hene, pêrunî xwe reyra tayn hene berdinî keye. Nimacê wexto şînî veyeke hewelnaynî, ganî destê yînî he-nekerdey bibînî.

## strana hesinkarı\*

çakûcê min ji hesinî  
hiltê jor û datê jêr  
ez xwîna xwe didim hesinî  
dibe pola hişk û têr

horsê min hêrsa min e  
hesinkar im hesinkar im, agir sor e  
hesinkar im, hesinkar im, hesin zor e  
were ey hêlm ji kezeba şewitî  
were wek bahoz û bager, bila agir ne-

bore  
min hesin ji axê parzand  
min hesin ji xwehdanê xwe  
ji evînê min ew parizand  
ji xwehdana evînê

horsê min di nav xwînê de  
xwîna lawên min  
çakûcê min di nav xwînê de  
xwîna keçen min  
dikutim ez hesinî  
hesin hişk e, wek xişma min  
hesin nerm e, wek evînê  
ez hesinî dikutim  
ez zilmî dikutim

hêsinkar im hesinkar im agir sor e  
hesinkar im, hesinkar im hesin zor e  
birîn zor e, dijmin xwînxwar, zulum  
har e,  
ewrêñ reş li ser çiyayêñ welêt diborin  
dewlet li ser milêñ Kurdistanê, kete  
xwînê, dewlet bar e  
mîrê Kurd qet ber xwe nade, kete  
xewê  
dixwaze ku rizgar bibe, lê kewtî ye,  
ew nikare  
her qeraxa welêt xayîn wek heywa-  
nan ji cihennem  
dewlet rûres, dewlet zalim, tev înakar

e  
ey kole, tu bi ku ve herî,  
tu tenê yî zindan tarî,  
bê ronahî, bê hawar e

lê dem didît, li tariyê, yekî gernas  
ew Kawa ye, xwedî qewet, hesinkar e

ew Mazlum e, li dijî zilm ber xwe di-  
de,  
ew Kawa ye, xwedî êgir, xwedî hêvi,  
xwedî qewet

li zindanê bo gelê xwe fidakar e  
ey dewlet tu, wek tariya ber ronahî  
belav bibe, xera bibe, hilbiweşe,  
Kawa hatiye, ew Newroz û ew bihar  
e

ew çar rabûn, wek çar rojan  
evîndar bûn ji dil û can, ev lehengêñ  
cîhanê  
hatin ji bo şer, bejnêñ bilind cih gir-  
tin li meydâne  
çekêñ wan tunebûn, li agir geriyan  
li agirek bilind geriyan ku bişewite  
dewlet

û dil qîrî  
û dil jê hat  
û dil derket ji singêñ qehremanê  
herkes didît, dil di nav evîneke sor  
de,  
dil bi xwînê, tev bû agir ket zindanê  
tev bûn brûsk, tev bûn stêrk, dibari-  
yan ji ezmanê  
agir coş bû, agir bilind, agir ges bû  
ew şewitîn, di nav pêtê, gor tuneye ji  
bo wan

ew bûn hêvi, bûn mîrxasî, bûn bere-  
ket li ser axa Kurdistanê

bibîn Kurdo, wan lehengan, ew bûn  
azad bi berxwedan  
ew şewitîn, ges bû jiyan, coş bû ji-  
yan, xweş bû jiyan  
ew bûn stêrk, ta ezmanê bilind kirin  
jiyanê  
li wan bigger li her derê, ew dilketi-  
ne, dilketiyêñ Kurdistanê

horsê min hêrsa min e  
hesinkar im hesinkar im, agir sor e  
hesinkar im, hesinkar im, hesin zor e  
were ey hêlm ji kezeba şewitî  
were wek bahoz û bager, bila agir ne-

bore  
\*Ji şanoya "Jiyana Nû" hate girtin.

# NIŞTIMANA XWE BINASE

# AGIRÎ

Rojê CIVAKNAS

Bajarê Agirî ji deryayê 1640 metro bilind e. Bilindiya çiyayê Agirî yê mezin 5165 metro ye. Çiyayê Agirî yê biçûk 3925 metre, çiyayê Tendurekê 3542 m, çiyayê Sipanê (Süphan) jî, 4058 metro ye. Şaxê herî mezin ê çemê Feratê, Mirad (Murat) ji vir derbas dibe. Li Agirî zivistan pir sar û cemidî ye. Pênc mehan berf li erdê dimîne.

### Dirok

Li şikeftên derdora Agirî, Diyadîn û Beyazîdê lêkolînen ku hatine çekirin, berî Zayînê 7 hezar sal gelê Arî li vir bi cih bûye. Li van deran volkan û laxên vemirî hene. Navê Agirî bi xwe ji wî agirê volkanan tê. "Ararat" jî, ji van herdu bêjeyan çê bûye.

Di lêkolînen ku

ala (BZ. sedsala 7.) Medan de kom bûn. Medan van deran ji Îskîtan paqîj kirin. Dûv re Persan van deran bi zorê ji Medan stendin. Berî Zayînê sala 400'î Îskenderê mezin Persepolis şewitand û xiste destê xwe. BZ. di sedsala 6'an de Ermen (Ermenî) hatin vê derê û İmparatoriya Artaksiyad avakirin. Ermen bandora xwe hetta sala 193'an domandin û dûv re (di

Mogolan. Ev der demekê dirêj di bin destê Persan de ma. Ji sedsala 16'an vir ve ev der ketine bin destê Osmaniyan. Di dema TC'de, gundê Kosê bûye bajar.

### Dirok û Derdora Xwezayî (Tabîî)

Xaniyên li vir 1.5 metro li ser bin geha keviran û ji kerpiçan çedibin. Serê banêwan rast in û ber bi hewşê ve 2-3 mezelên (ode) wan hene. Berhemên dirokî, ji otantika Urartu û hunerên wan hatine çekirin.

### Kompleksa Qesra Îshak Paşa

Qesra Îshak Paşa, şopa hunerê Arî tê de xuya di be. Ji wê demê heta roja îroyîn tu berhemeke weke wê nehatiye çekirin. Ev qesra ha weke keleha Urartu ya û li ser şaxên zi-

di vê deverê de hatine kirin, mohrên Mîtanî û Huriyan dibînin. Ev mohr jî, yên sedsala 16 û 13'an berê Zayînê ne. Em ji van tiştan derdixin, ku Mîtaniyan, bandora xwe hetâ Qafqasyayê fireh kirine. Ev gelên bi navê Bîanî ku 300 sal weke prenstiyan (BZ. 1200-900) ji hev cuda dijiyan, bi Konfederasyona Urartu ve giredayî bûn û ji wan tevan re Urartu dihate gotin. Ji bakur koçerên Kimêr ên hov û talankarêñ Îskit hatin û van deran şewitandin. Gelê Arî li Zagrosê di bin

sedsala 11'an de) kete binê bandora Romî û Bîzansan. Van deran carna ketine bin bandora Part û Sasaniyan jî, leşkerên Romiyan du caran hatine Agirî, lê belê mecbûr man û dîsa vegeriyan. Di sedsala 7'an de Erebêñ misilman van deran dagir kirine; dûv re ev der dîsa ketiye destê Bîzansan. Di sedsala 11'an de ev der ket destê Tirkan.

Tirk di sedsala 13'an de di şerê Kosedaxî de xwe li ber leşkerên Mogolan negirtin û ev der ket bin destê

naran çêbûye. Qesr 115 x 50 mitro cih digre û 366 mezelên wê hene. Ev qesr, ji hunerên Urartuyan hatiye neqışandin.

Koka motifên Urartu jî, ji Zigurat tê. Ew jî, mîmariya Kurdan e.

Kevirêñ ku ji vê qesrê rakirine bi wan qışla Beyazîdê çekirine.

Di hundirê vê qesrê de pêtagêñ zadê (embara zexîrê), celebêñ kar-mendiyê, kargeh, cihêñ leşkeran û cihêñ zindanan hene. Li ba qesrê jî, xwendeghehek heye. Cihê ku gel lê rû-



dinên li binya qesrê ava bûne.

### Keleha Kamo

(Cenevîz)

Keleha Kamo, li rojhilata qesra İshak Paşa dikeve. Berî Zayînê di sedsala 8'an de ev keleha ha bi destê qralê Urartu çêbûye. Ev keleha ha, ji bo Xwedayê Xaldiyê çêkirine. Armanca vê kelehê leşkerî ye. Di hundirê wê kelehê de şkeft û mizgeft hene.

### Gora Ehmedê Xanê

Gora Ehmedê Xanê li rojava li aliye mizgefta Belebircê dikeve. Li ba tirba Ehmedê Xanê kaniyek bi navê Abdigor (Evdîgor) heye. Ev tirb ziaretgeha xelkê ye.

### Çiyayê Agirî

Di nav deşta İdir (IĞDIR) û deşta Beyazîdê de cih girtîye. Firehbûna çiyayê Agirî 1188 km<sup>2</sup> ye. Çiyayê Agirî volkanik e û vemirî ye. Bilindiya çiyayê Agirî 5165 metro ye. Li

Ewrûpa û li Rojhilata Navîn tu çiya wilo bilind nî ne. Li serê çiyayê Agirî 120 -160 metro rastî heye. Nêzîkî 4000 metro bilindiya wî pê ve zivisitan û havînê bi berf û bi zemzeliqan xemilandîye. Çiyayê Agirî bi zinarêñ xwe yên reş ve gelek bala mirov dikişîne û mirov heyran dihêle. Ji ber vê yekê pir çîrok, destan û efsane li ser vî çiyayî derketine.

### Şkefta Cemedê

Di navbera Bazîdê û Gurbulakê de, li ser rê 28 km. ji Bazîdê dûr û ji çiyayê Agirî ve 10 km. dûr e. Havînê mirovîn ku nezîkî wan deran dijîn, ava cemidî û cemed ji wir peyda dikin.

### Koncalâ Meteorê

Koncalâ meteorê 35 km ji Bazîdê dûr e û li Gurbulakê ye. Di sala 1920'an de ji ezmanan kevirek hatiye

xwar û li vir koncalekê çêkiriye. Fi-rehbûna vê koncalê 35 metro û kûrbûna wê jî, 60 metro ye. Dibe ku ev

lind û şîn ve xemîlî ye û li serê çiya berf xuyanî dike û bi ava wê ya şêrin tê nasîn. Di hundirê golê de masiyêñ

kelûça çin, keşine (alabalik) û sazan hene. Li aliye bakur-rojava peravek (ada) û li ser vê piravê jî wêraneyek heye. Di polê de quxu û teyrêñ din hene.

### Girê Anzavûrî

Girê Anzavûrî 10 km. ji Patnosê dûr e. Li aliye bakur-rojhilat dikeve. Berî zayînê di sedsala 8'an de ji aliye qiralekî, bi navê Anzawurê çêbûye. Kele hû mizgeft ne wek bajarêñ Urartuyan hatine çêkirin. Dûv re jî, bi bendan (sur) bi hev ve girêdane Bingeha mizgeftê, ji kevirêñ bazalt ên reş hatiye çêkirin. Li ser bingehê jî, diwar ji kerpiçan hatiye hunandin.

### Gewe

Gewe, li tezgehê erdê tê hunandin. Ji tayê cacim şîdayî 10-15 santîm dirêj, ji hiriya

neveçirî û wek girêdana xaliyan çêdi-kin.

Agirî, piştî sala 1984'an, bû wargeha gerîlayêñ leheng. Çiyayê Agirî bixwe jî, ji gerîlayêñ ARGKê re bû hêlin. Şerê gerîla di nav gelê Agirî de, di demeke kin de xurt û belav bû. Bi vî awayî, bîr û baweriya neteweyî di nav gel de ges bû. Li Agirî bi hezaran welatparêz li dor tekoşîna rizgariya neteweyî berhev bûn. Ev berhevbûn, her bi her berfirehtir û xurtir dibe. Gelê me yê vê derê, di serhildanan de bi şêweyeke biryardar cîhe xwe yê bi rûmet digre û li gerîlayêñ xwe xwedî derdikeve. Bi kurtaşî, Agirî di tekoşîna rizgariya neteweyî de niqteke berxwedanê yê girîng e.

Ne tenê hêvî ye ew, ew bi xwe rasîya leşkerêñ Kurdan e ku ewê serbi-kevin û ne tenê Agirî, her derê welêt têxin destê xwe ▲

### Girê Şerê Siyar

Girê Şerê Siyar, li dora qesra İshak Paşa bi tonêñ rengêñ sor, şîn û gewr ve xemiliye. Di nava rojê de her saet rengêñ wê yê girî têne guher-tin û dibin rengêñ nû.

### Pira Qudretê û Germav

Sê germav li vir hene. Di van ger-mavîn hanê de kukurd heye. Ji bo nexweşîyen çermî, ji bo ba û êşen curbecur pir bi kêr tê.

### Gola Masiyan

Dora gola Masiyan bi çiyayêñ bi-



# Di Kurdî de Eyleta Bêje, Biwêj û Organên Mirov

(2)  
- DEST -

Amed TÎGRÎS

**Dest:** Du organên mirov, ên ku bi wan kar tê kîrin.

**Destar:** Kevirênil gilover in ku pê genim dikin ard. Aşê destî (bi dest).

**Destav:** Tuwalet. "Rizgo li ser destavê kuştin."

**Destfireh:** Merd, çavtêr. "Bager xortekî destfireh e."

**Destber:** Bereket. "Pembûyê me îsal gelek destber e."

**Destî:** Destiyê aletekî, cihê ku mirov pê digire. "Destiyê bêrê şikestîye."

**Destik:** 1) Destikê aletekî. 2) Dema jin kar dikin, ji bo ku hûçikên kincênen wan neşewitin, an jî zerar nebinin, dikin destê xwe; piştgirî, piştevanî.

**Destdan:** 1) Tiştekî ku mumkin be. "Şert dest dan ku ez te berdim."

2) Bi dest dirutin.

**Desthişk:** 1) Çıkûz, kinoj, bi Tirkî 'cimri'. "Heke mirovekî desthişk e..." 2) Kesê ku destê wî giran e. "Destê Evîndar hişk e, wek kevir e."

**Destûr:** 1) Prensib. 2) Îzin, bi Tirkî 'tüzük'. "Destûra komela me hat qebûl kîrin."

**Destûri:** Qanûnî, bi îzin.

**Destûrdan:** Îzindayîn. "Ji kerema xwe re destûra min bide, ez dê hemîm."

**Destok:** Heywanênu ku ji mirov narevin, jê re tê gotin. Fêrbûn. "Pisîka me destok e. Ew ji mirov nareve."

**Destkir:** Karê dest, bi Tirkî 'elişî'. "Karê destkirî li Ewrûpa gelek biha ye."

**Destkird:** Sûnî, çêkirî. "Hemû bêjeyê destkird ne rast in."

**Destşûştî:** 1) Mirovên ku destêne wan paqîj in. Ji aliyê exlaq ve, mirovê paqîj, pak. "Ew mirovekî dest-rûşûştî ye."

**Destpak:** Ew kesê ku diziye nake û her tim karêna baş dike, jê re tê gotin.

**Desteng:** 1) Xizan, feqîr, 2) Cikûd, çigmez, cimrî.

**Destkîsi:** Alîkariya bi dizî. "Ew bi destkîsi dest li pişta te dixe."

**Destdirêjk:** Maşe. "Agir bike nav destdirêjkê ku destê te neşewite."

**Destpêk:** Ji serî ve, ewil. Bi Tirkî 'başlangîç'. "Em hîn di destpêka karî de ne."

**Destkêş:** Lepik, pêçik. Bi Tirkî 'eldiven'.

**Destkêşî:** 1) Alikarî û piştevaniya xwe bi paş ve girtin. 2) Dev ji karekî an jî ji tiştekî berdan. "Destkêşîya te karê me li paş xist."

**Deste:** 1) Qevd, berhevkirina tiştekî. "Destek kaxezê min heye." 2) Bi Tirkî 'takım' (a eskeriyê), bi İngilizî 'platoon'. "Destek leşker êrişî ser gund kîrin."

**Destek:** 1) Bi qewetkirin, ekstra. "Divê em deriyê xwe destek bikin ku diz nikaribin vekin." 2) Piştgirî, alîkari. "Pêdivêtiya (İhtiyaciya) min bi desteka we heye."

**Destan:** Destana ku wek stranê tê xwendin. Mînak, destana Memê Alan a netewî."

**Destketî:** 1) Tiştekî ku ji dest keti-

ye. "Ev ji destê min ket erde." 2) Erzanbûn. "Ev biskîlêt destketî ye û ji ber wê yekê min gelek erzan kîrî."

**Destbira:** Hevalê herî nêzîk û baş. "Ez û Amed destbirayê hevdune."

**Destbiratî:** Hevaltiya herî baş û qenc. "Destbiratî pir xweş e."

**Destavîtin:** 1) Hewildan. "Me dest avêt vî karî ku rojekê zû biqedînin." 2) Tecawiz, zordesî, xapandin. "Demirel dest avêteviye demagojiyê û xelkê dixapîne."

**Destberdan (Destdaber):** Piştgirî. Alîkari. "Tu xanî bikire, ez dest didim ber te."

**Destserdan:** Bin dest kîrin. İsgal kîrin. "Hikumetê dest da ser kovar û rojnameyên şoreşgerî."

**Destborîn:** 1) Efû xwestin, lê borandin. 2) Selamet.

**Desthevdan:** 1) Mirov bi destêne hevdû digire. "Erd şimatok bû. Me dest da hevdû û em neketin erdê." 2) Piştgirî û alîkariya hevdû kîrin. "Em dest bidin hev, dijmin tu carî bi me nikare."

**Des(t)geh:** Cihê karî. Di gotinê de "t" ketiye. "s" ji bûye "z". Ango "destgeh" bûye "dezgeh". "Dezgehê te baş e".

**Destşok:** Ciye ku mirov destê xwe dişo, lewabo.

**Destnivîs:** Nivîsara ku bi dest hattîye nivîsandin.

**Destkî:** Navê nanê bê hevîrtîş. Nanê fetîn. "Ez nikarim nanê destkî bixwim, zikê min dêşe."

**Destsivik:** Jêhatî. Ji wan mirovan re tê gotin, yên ku kar ji destê wan tê. "Can mirovekî destsivik e."

**Des(t)mêj girtin:** Ji bo îbadetê dest, ser û çav û cihêن din şüştin. "Her roj ez bi ava sar destmêj digirim."

**Destşikesti:** 1) Bêgavî, bêçaretî û bêimkanî. "Ma destî te şikestiye?" 2) Kesê ku destê wî şikestiye.

**Destqerimî:** Westayî, ecizbûyî. "Destê min di binê min de qirimî ye."

**Destere:** Birek. "Ka destereyê bîne, em texte bibirin."

**Des(t)mal:** Qumaşê ku mirov pê dest û pozê xwe paqîj dike. Mendil.

**Desthilatî:** Hulim, iqlîdar, otorîte. "Desthilatiya Kurdan bê emr e."

**Desthilatdari:** Hikumdarî, iqtîdar, otorîte. Desthilatdariya Osmanî barbarî bû."

**Desthene:** Henekirina bûk û zavê.

**Destegir:** Terefdar, alîgir. "Ew destgirê Mele Barzanî ne."

**Destegiri:** Terefdarî, alîkarî. "Alîgiriya wan ji me re fêde nayîne."

**Destgir:** Alîkar bi Soranî ye. "Mîdûre dibistanê istîfa kir û destgirê wî ket şûnê."

**Destvala:** Bêçek, bêpere, bêmal. "Ez iro destvala me, dibe ku şeytanok werin pêşıya me."

**Destgirtî:** 1) Ya bi nişan kîrî. "Ev keçika han destgirtî ye." 2) Mirovê çikus, egoîst. "Azad mirovekî destgirtî ye, qurişkî xwe xera nake."

**Destvekirî:** Merd. "Murad gelek destvekirî ye. Pere têra wî nake." 2) Kesê parsek. "Mirovê ku destê xwe ji xelkê re veke, ji tu tiştekî re jî nabe. Ew rihye ye."

**Destnizim:** Bindest, destê bin kevir. "Ez ci bikim, ez destnizim im, nikarim tiştekî bêjim."

**Destbikar:** Bi meharet, bi berhem, jêhatî. "Birayê min mirovekî destbikar e."

**Destmiz:** Ucret, yewmiye. "Destmiza te çiqas e?"

**Destedûr:** ne di bin kontrolê de, ji derê qewetê. "Em nikarin pêş li Memo bigrin. Ew ji me destedûr e."

**Desthildan:** Serhildan, raperîn.

**Destdanîn:** Stûxwarkirin, teslimbûn. "Em ji dijmin re dest danaynin."

**Destkişandin:** Ne alîkar, poşmanî. "Me destê xwe ji alîkariyê kişand."

**Destvekirin:** 1) Parskirin. 2) Mirov destê xwe yê girtî vedike.

**Destber:** Duayekî baş. Destxwes, destsax, destşin jî tê gotin. "Destê te bi ber be, te ev xwarinê xwes çekiriye ha!"

**Destşin:** Dester.

**Destxwes:** Ev jî wek dester û destxwes e.

**Destarî:** Hêz û kesên bi dizî, ne bi qanûnî û diyar. "Rojnamvanê Kurd bi destê kesên destarî têş şehîd kîrin."

**Destneşûştî:** 1) Kesên ku destê wan qirêj in. 2) Mirovê nepak, nebaş. "Ew mirovekî destneşûştî ye."

**Destepostî kîrin:** Parastin, veşartin. "Hinek çûne, bûne peyayê dewletê, hinek jî, ji wan re destepostiyê dikin."

**Destnîşan kîrin:** İşaret, diyar kîrin. "Wî, vê yekê destnîşan kir ku na-be."

**Destê bin kevir:** Mecbûrmayîn, bêçare mayîn. "Heta ku bûk ji mala bavê derkeve, destê bin kevir e. Em nikarin tiştekî bêjin. Paşê em dê bersiva wan bidin."

**Dest li pişt dayîn:** Dest li pişt xistin. Destekkirin, fitkirin. "Te dest li pişta lawê xwe daye û ew berdaye meydanê ku li zarokên xelkê bixe, na?"

**Dest û ling şûştî:** 1) Mirovê ku dest û lingê wî şûştî ye. 2) Mirovê pak, paqîj ku têkili tiştên xerab û pîs nabin. "Îftira li min dike, ez mirovekî dest û ling şûştî me."

**Dest jê şûştin:** Bêhêvîbûn. "Keça min nexweş ket. Edî me destê xwe jê şûşt. Lî paşê bi alîkariya bijîk (doctor), rehet bû."

**Dest di rûn û hingiv de bûn:** Xwedîyê karê giring bûyîn. "Dest û lingê te di hingiv de bin jî, divê tu bê."

**Destetikgorik:** Lepik, bi Tirkî 'el-

diven'.

**Destedêr:** Avdana mecbûrî û acîl. "Divê em bexçe destdêr bikin an jî, wê hişk bibe."

**Destekdayîn:** Piştgirî kîrin, alîkarî kîrin. "Destekdayina Partiyê pêwîst e."

**Destek dîtin:** Îmkanên alîkariyê dîtin, piştgir dîtin. "Divê em destekîn nû ji xwe re bibînin."

**Destek kişandin:** Alîkarî û piştgiriyê sekandin an jî birandin. "Min desteka xwe jê kişand."

**Destjêhatî:** Mêrxas, bi miharet. "Gulo mirovekî destjêhatî ye. Gelek tiş ji destê wî tê."

**Dest li ser danîn:** Nedan. İsgal kîrin. "Min dest da ser vê meseleyê."

**Destkurt:** Destkin, bê îmkan, bê iqtîdar, belengaz. "Destê min kurt e, ez nikarim vî karî bi cih bînim."

**Dest ne çûyîn:** "Tu hevalekî min ê baş i. Destê min naçe te, ku li te bixim."

**Dest bin çengê ketin:** Bêgavbûn, perîşanbûn. "Otomobîla min naxebite. Desten min ketine bin çengê min. Ez nikarim bi derekî ve herim."

**Dest bi ser:** Destê xwe ser tiştekî dayîn. 2) Kontrolkirin. "Ez dê dest bîdim ser vê bûyerê."

**Dest û ling lê qefilandin:** 1) Cemidandin. "Ji sermayê dest û ling li min qefilîn." 2) Malwêranî, malkambaxî. "Perdeya me vê mehê nehat, dest û ling li me hat qefilandin."

**Dest zêr birîn:** Kesê bi meharet, hunermend. Ji wî kesî re tê gotin ku pere qezenc dike. "Destê Xecê zêr dibire. Ew dirûnê dike."

**Dest xwe birin:** Mêranî cesaret kîrin. "Wî dest bir xwe û bi mêranî çû ser dijminê xwe."

**Dest xwe kîrin:** Dest xwe birin.

**Dûredest:** 1) Ne nêzîlk. 2) Bê îmkan. "Pirtûkên min hene, lê dûredest in." "Dûredestî malxirabî ye."

**Dest bi xêr:** Karê xwe baş kîrin. "Destê te bi xêr e."

**Dest bi bereket:** Karê xwe baş çûyin. "Destê te bi bereket e."

**Dest danî ser:** Zorbatî, bi zor girin. "Dest danîn ser malê me."

**Dest jê berdan:** 1) Dev jê ber-

dan, poşmanbûn. "Min dest ji karê xwe berda." 2) Temambûn. "Ez her roj di saet 19'an de dest ji kar berdim."

**Dest ber dan:** 1) Dest ber tiştekî dan. "Zorav kevir avêt sêvê. Min dest nedana ber wê, serî lê perçê bi-ba." 2) Destek kîrin. "Ez bi xwe dest didim ber te ku tu bikaribî vî karî pîroz bi cih bînî."

**Dest li pişt xistin:** 1) Dest li pêş tiştekî xistin. 2) Alîkarî kîrin, fit kîrin, pîj kîrin. Bi Tirkî 'kışkırtmak'. "Te dest li pişt lawê xwe xistiye û ew berdaye meydanê."

**Destbixwîn:** 1) Mîrkuj, qatîl. "Mîrza mirovekî destbixwîn e. 2) Ew kesê ku xwîn bi destê wî ve heye.

**Dest ji ber kişandin:** Dev jê berdan, alîkarî nekirin. "Me destê xwe ji ber wî karî kişand."

**Di dest de mayîn:** Tişte ku di destê mirov de dimîne. "Ev otomobîl di destê me de ma û çû."

**Dest bi xwe kîrin:** Dest dayîn, dest pêdan. "Heger tu destê xwe bi min biki, ezê dîsa wenda bibim."

**Dest lê gerandin:** Berketin. "Çawa destê te geriya, te ez birîndar kîrim."

**Dest li pêşîr bûn:** Pêşî bernedan. Bi zorê heqê xwe stendin. "Li vê dînyayê û li wê dînyayê destê min li pêşîra te ye!"

**Dest dayîn:** Fersend, îmkan. Bi Tirkî 'elvermek'. "Ji me re dest dide ku xelk malê me bixwe?"

**Dest kulav ketin:** Tiştekî dijwar lê bûyîn, bi tiştekî nikaribûyîn. "Ma destê te ketiye kulavê ku Zero li te xist û serê te şikand?"

**Dest dev gîhiştin:** 1) Jê îmkan çê-bûn. "Kawê Ase mezin bû, tam destê wî gîhişte devê wî, vê carê mala wî şewitî."

**Dest nedayîn:** Bê îmkan bûn. Bi Tirkî 'elvermemek'. "Ji me re dest nade ku xelk li ser axa me, li me serdestiyê dike."

**Destê bindest:** Mecbûrî, bê îmkan. "Heta ku bûk ji mala bavê derkeve, destê bindest e. Paşê ew dê ji xwe re bibînî."

**Dest kîrin:** Kontrol kîrin. "Ka ez

dest bikim, ci di çavê te de heye."

**Dest qufaltin:** Hurmet lê nişan dan. "Ez li ber te destê xwe duqfêlim."

**Di nav dest de bûyîn:** 1) Pêgirtin. 2) Di bin kontrolê de bûyîn. "Edî tu meraq meke, ew di nav destê min de ye."

**Dest jê kîrin:** Li ser idare û şert tê bi kar anîn. "Heger ev mesele ne wek min be, ez dê destê xwe jê bikim."

**Destdirêj:** Zorba, zilimkar. 2) Xwediye desthilatiyê. "Destê me dirêj e. Em dikarin bigihêjine her derê."

**Destdirêjî:** Zorbatî, zilimkarî, desthilatî. "Destdirêjî karekî ne baş e."

**Destberketî:** 1) Destê birîndar, se-qed. 2) Bêgav û bêçare. "Gayê min mir, destê me ket ber me. Edî em ni-karin erdê xwe biçinîn...."

**Destê biyanî:** Tiştên ku bi bîryar û kîrina xerîban be. "Biyanîyan destê xwe kîrine nav kar û barê Kurdistana Başûr."

**Destgirêdayî:** 1) Bi tiştekî dest girêdan, 2) Bêçare, bêgav. "Şeytanok bi çek in û dewlet li pişt wan e. Em kesen sivil wilo destgirêdayî mane."

**Destşifa:** Ew kesen ku kar û barê bijîjki dîkin, jê re tê gotin. "Doktor Abdilbaqî destşifa ye."

**Dest bi xwe ve dan:** Bi dil qebûkîrin. "Di nav hemûyan de Dilo dest bi xwe ve da ku here welêt."

**Destpelixî:** Bê kîr, nejêhatî. "De behsa wî rebenî neke, ew mirovekî destpelixî ye, nikare tiştekî bike."

**Destdayî:** Bi îmkan, bi merc. "Ev destdayîyen me ne ku em bikaribin wan bi cih bînîn?"

**Dest li ser danîn:** Bi îmkan, kontrol kîrin. "Em dê vê carê dest li ser malê wî deynin."

**Dest bi ser dan:** Dest ser danîn. Îşgal kîrin, girtin, nedan. "Hikumetê dest bi ser malê me daye."

**Dest bi kevir:** 1) Yê ku kevir di dest de ye. 2) Li ser rê amadebûn. "Ew mirovekî dest bi kevir e."

**Dest birin:** Têkilî qut kîrin, jê dûrketin. "Ji mirov û der û dorêne we-

ha pîs, divê mirov destê xwe bibire.

**Desteyê nivîsaran:** Redaksiyon, kom.

**Destbelav:** Yê ku bê hesab mesref dike, bê ser û ber. "Soro mirovekî destbelav e. Tu pere pê re namîne."

**Destqirêj:** 1) Ji ew kesan re tê gotin, yên ku destê xwe naşon. 2) Ji ew kesan re tê gotin, yên ku karêne nebaş dîkin. "Zoro mirovekî destqirêj e. Diziyê dike."

**Destqirêjî:** Nebaşî. "Destqirejî ne karê ciwanmîran e."

**Dest bi dest:** Bi hev re, bi yekîti. "Divê em Kurd dest bi dest bin ku dijmin nikaribe zêde bi ser me ve we-re."

**Destegul:** Çelenga gulan, demeta gulan. "Me roja inê destegulek bir ser gora(mezelên) şehîdan."

**Dest bir xwe:** Bersiva bi fizikî, şer-kerin, xwe parastin. "Dema tîman me gulebaran kir, me jî dest bir xwe û bi keviran bera wan da."

**Dest ber dan:** Parastin, alîkar bûyîn, qebûl kîrin. "Ku tu karêne xirab dîki, ez nikarim dest bidim ber te."

**Dest jê berdan:** 1) Temam bûn. "Ez her roj saet di heftan de dest ji kar berdim." 2) Poşman bûn, dev jê berdan. "Min dest ji rezê xwe berda."

**Dest jê kişandin:** Dev jê berdan, xwe pasve kişandin. "Min destê xwe ji vî karî kişand."

**Dest bilind kîrin:** 1) Destê xwe li hewayê rakirin. 2) Bersivdana fizikî, desthildan. "Polis zirtan kir, me dest bilind kir, ew reviyan."

**Dest bi zor:** Xwedi kar û qezenza baş, "Ew dest bi zor e."

**Destenivîsar:** Redaksiyon.

**Destnêj:** Bi dest danîn, bi dest ci-kandin. "Ev gul ne tebû ne, destnêj in."

**Dest li piştê xistin:** 1) Fîtkirin, pîj kîrin, destek kîrin. "Hikumatê dest li pişt şeytonakan xistiye û ew jî har bûne." 2) Mirov destê xwe di-de piştä yekê."

**Destgûhartin:** Mal û tiştên kevn û bi kar hatî. "Ev çeka min pir dest guhartiye."

**Destgiran:** 1) Yêñ ku destê wan hişk in û mirov dêşinin. 2) Bêkêr, yêñ ku kar ji destê wan nayêñ. "Dara, ntirovekî destgiran e."

**Dest lê gerandin:** Tiştên bikarhatî tevlîhev kîrin, xirab kîrin. "Kê destê xwe li vê TV gerandiye û ev xirabe kîriye?"

**Dest jê hilgirtin:** Fêde dîtin. "Min dest ji vê xaniyê hilgirt."

**Dest vemaliştin:** Wezîfe girtin, destpêk. "Ev destvemaliştina min e."

**Destçûyi:** Bê imkan, ji dest derketî. "Ji destê min çû, divê min radyoya xwe nefirota."

**Destwêşandin:** 1) Destê xwe li baxin, dileqinîn. 2) Xwestin. "Tew, ez biqurbana Xwedê me, lawê min destê xwe biweşîne dê 15 keç li pey wî bazdin."

**Av li dest kîrin:** 1) Mirov avê li destê yekê dike. 2) Nehêja bûn, ji yê din xirabit bûn. "Turgut Ozal hê av li destê Süleyman Demirel dike."

**Ber dest:** 1) Amade, hazır. 2) Hewcedar, muhtac bûyîn. "Yekî Zînê tune û pîr ji bûye. Ew ketiye ber destan." "Xwedê min nexe ber destê te lawo!"

**Ber destî:** Amadekirî, di emîr de amadebûn. "Lawê min bila li ber destê te bixebite."

**Bi dest berdan:** Musaede kîrin. "Ev mîh erzan e, lê min hema bi destê te re berda û çû."

**Bi destketî:** Mevcûd. "Yêñ bi destketî ev in."

**Bi dest ketin:** Xwedibûn, firsend dîtin. "Ev xam bi zor û bela bi destê me ket."

**Bi dest xistin:** Dîtin, xwedî bûn. "Min bi zor ve rojnama Welat bi dest xist."

**Bi dest çûn:** Plankirî. "Ew bi destê filan kesê çû."

**Bi dest û lepan ketin:** Şaş bûn, mehf bûn. "Em bi dest û lepan ketin nav vê bûyera han û em nikarin ji nav derbîkevin."

**Bi destpê:** Xurt, hêz. "Ew lawekî bi destpê bû."

**Bi destdayîn:** Tiştê ku mirov bi raste-rast bi destê xwe bide yekê din.

Pêşîn dayîn. "Min pere bi dest da te."

**Bi dest û dev ketin:** Hem ji aliye-kî gotin û hem jî, ji aliye pratikê ve ketina nav tevlîhevî û aloziyekê. "Em bi dest û dev ketin nav vî karî han."

**Bindest:** Dil, esir, jar, reben. "Ez bindestê patronê xwe me."

**Bindestî:** Dîlitî, rebentî. "Em dê heta kengî bindest bin?"

**Bi destî hatin:** Bi her tiştê xwe ve hatin an jî, bar kîrin. An jî ji binî ve hatin. "Ew bi destî ve ji Konyayê hatin."

**Bi dest û lingan ketin:** Ketina nav alozî û tevlîheviyeke ku êdî mirov nikare ji nav derbikeve. "Em bi dest û lingê xwe ve ketin nav vî karî."

**Di destê xwe de girtin:** 1) Tişteki nav destê xwe kin û di nav destê xwe de wî girtin. 2) Kontrolkirina tişteki, meseleyekî.. "Edî Kamoran Înan nikare eşîra xwe di destê xwe de bigire."

**Devdest:** Devdestê kiras, cihê ku li qevda dest komçe dibe.

**Jérdest:** Bindest. "Kurd, 700 sal in ku jérdest in."

**Jérdest kîrin:** Bindest kîrin. "Romiyan me 700 sal in ku jérdest kîrinne."

**Ji dest avêtin:** 1) Tişték di destê mirov de be, wî ji destê xwe bavêje. 2) Dayîn an jî firotina tiştékî ku mirov jê ne memnûn e. An jî pişî firotin an dayînê, poşmanbûna mirov diyar dike. "Lo pîrs neke, wele hema min ew ji destê xwe avêt."

**Ji dest ketin:** 1) Ji destê mirov dikevin erdê. "Sêv ji destê min ket nav gemarê." 2) Ew tiştên ku hatine bi kar anîn û buhayêñ wan erzan bûne re tê gotin. "Ev otomobil gelek buha ye. Ka çend rojêñ din jî bisekine, em dê ji te re yeka ji destketî bikirin."

**Ji dest derketin:** 1) Tiştê ku di destê mirov de be û ji destê mirov derkeve. 2) Bêgavî, bêmumkinî. "Edî serê vê meseleyê ji destê me derketiye, em nikarin kontrol bikin."

**Ji dest derxistin:** Firotin. "Min traktora xwe ji dest derxist."

**Ji dest çûyîn:** Ji dest derketin, ji

derê iradeya mirovî derketin. "Ji destê min çû, min dê radyoyek bikariya."

**Ji dest hatin:** Bi imkan, mumkun; kâribin. "Ji destê min tê, ez dikarim wêneyê baş çêbikim."

**Ji bin dest derketî:** Ji kontrolê derketî. "Edî ji bin destê min derket, here ba hevalan bila ew ji te re alikariyê bikin."

**Ji dest stendin:** Tiştên bi kar hatî, tiştên kevin kîrin. "Min vê radyoya xwe ji destan stend an jî kîrin."

**Ji destê yekemin:** Ji xwediye wî. Direkt. "Min xaniyê xwe ji destê yekemin kîrin, ne yê diwemîn."

**Ji destê diduyan:** Ne ji xwediye wî yê yekemîn, ji yê diwemîn.

**Li ser destê xwe gerandin:** Xapandin, karê biçûk pê kîrin. "Lawo ew te li ser destê xwe digerîne."

**Li destikan gerandin:** Li behaneyen gerandin. "Ji xwe re li destika negere, raste-rast bêje çîma tu do nehatî."

**Li ber destê xwe gerandin:** Xizmet kîrin. "Vî lawî bibe bila li ber destê te bigere an jî, bixebite."

**Li ser destan mezinbûn:** Bi nazi-kî û kîbarî mezin bûyîn. "Dema Zelal biçûk bû, ew li ser destan mezin bû. Hêr kesî jê hez dikir û wê dikirin hembeza xwe."

**Li ber destan mezin bûn:** Perwer-dekirineke dûr û dirêj. Gehıştanin. "Ew li ber destê min mezin bûye. Ji ber vê yekê jî, ew vî karî baş dizane..."

**Piştdest:** Pişta destî. "Piştdestê min dêše."

**Piştdestê xwe şewtandin:** Tobekirin, poşmanbûn. "Ji bo ku ez careke din pere deyn (qerz) nedime xelkê, min pişta destê xwe şewtand."

**Serdest:** Zorba, deshilatdar, bi hêz. "Tirk tim dixwazin serdest bin."

**Serdestî:** Zorbatî. "Serdestî û wekhevî tim li dijî hevdu ne."

**Zordest:** Zorker, zilimkar. "Zordest nikarin bibin humanist û mirov."

**Zordestî:** Zorkerî, zilimkarî. "Zordestî bi xwe re berxwedanê jî tîne."

## HEVPEYVİN

bi

## f. huseyn sagniç

re

**Rewşen :** Mamosteyê me yê heja, Enstituya Kurdi berî salek hat damezirandin. Di nav vê salê da hin xebat jî hattin kirin. Li ser girîngî û wateya Enstituyê hûn ji me re ci dikarin bibêjin?

**F. Huseyn Sagniç :** Enstituya me bi navê "Enstituya Kurdi" roja 18.4.1992 an da bi mehrîcanek babetî hate vekirin. Di vê vekirinê da têgihîn giran hene. Nemaze li nav dewleta ku jîna wî li ser înkara Kurdan hatî damezirandin, ew jî bajarê wî yê hêri mezin ku, ji sê mîlyonan zêdetir Kurd heyî, di Stenbolê da vebûna wê, têgihî garantir dike. Ev yeka han giyanê (ruhê) me vedijine. Navê wê jî têgîhdar e. "Enstituya Kurdi". Ne ku Enstituya Kurdi li Tirkyê, an jî Enstituya Kurdi li Stenbolê ye. Nexwe ev Enstituya han ya Kurdan hemî ye. Berî her karî ev pûngala zanînê li me

û ji gelê me ra pîroz bit. Ewêne pir û hindik keda (emeka) wan gihîjtiye vê pûngala pîroz, ji wî ra jî pir spas... Hêvidar im, her dem karêñ weha qenc ji destêñ wan derkevin û yên mîna wan jî pir bibin.



Hemine ku di van mercan (şertan) da vekirina Enstituya Kurdi, ne karekî hêsan e. Hê jî dewleta Tîrkiyê, nikare peyva "Kurd" ragire. Ne karî peyva Kurd li ser tabelaya Enstituyê jî bipejirîne. Ji bo vê peyvê du

caran tabela ji alî polisan ve hate dänîn. Enstituya me hê di bin qerewîla polisan da ye. Ev qerewîl, ne ku ji bo parastina Enstituyê ye.

**Rewşen :** Li ser gelş û dijwariyên zimanê Kurdi û rewşenbîrên me, ji bo çareserkirina van pirsgirêkan, pêşniyaren we ci ne?

**F. Huseyn Sagniç :** Demek pir drêj e ku em ji çanda xwe ya netewî hatine dûr xistin. Beşek ji me, di çanda Ereban da hatiye gihîjandin. Beşek di çanda Tîrkan da û hwd. hatîne perwirandin. Anglo yekîtiya çandî di nav xwenda û rewşenbîrên me da tune. Her yek ji me, bi awayê çanda biyaniyek dihizire û dest davêjîne çanda xwe. Belê di nav gelê me da yekîtiya çanda netewî û gelêri heye. Lî xwendin û perwirandina ferdên gel téra xebatêñ zanîstî (îlmî) nake. Be-

şek ji Kurden başûr (Soraniyê Iraqê) bi tevlîheviya çand û wêjeya Erebi û Kurdi hatine gihîjandin. Hemine ji wan çetir wec tê dîtin. Lî ne tevayî û ne bese jî.

Giraniya diroka me, ji aliye biya-

niyan ve hatiye nivîsandin. Ev yek jî, nehiştiye di nav me da yekîtiya dîtin û nêrîna dîrok û menşeyê Kurdan pêkbê. Beşek ji me: "Kurd ji Avropayê hatine", dibêjin. Beşek din jî: "Kurd ji ciyayên Zaxrosê peya bûne" jê dabaş dikan. Hindek dîrokzanê me "Kurd ji hawîrê herêma gola Urmiyê derketine", dibêjin. Giraniya dîrokzanê me jî "Menşeyê Kurdan Mezopotamya bixwe ye" dibêjin. Her bes jî, li ser îspatkirina dîtina xwe di-xebitin.

Di nav me da hê yekîtiya elfabê pêknehatiye. Hinek ji me, ji tîpêni Kîrîl elfaba Kurdî çekirine. Hinek jî, ji tîpêni Erebî elfaba Kurdî çekirine û heya zanoşgehê jî pê dixwînin û xwendine jî. Beşek din jî ji me, ji tîpêni Latînî elfabe pêkanîne û gelek zêde jî li ser radiwestin. Bi vê elfabê jî gelek afîrînek hatine nivîsandin.

Em tîpêni Latînî bikartînin. Lî di nav me da hê jî yekîtiya dengen û ji dengen dervazbûna tîpan, nehatiye himatê (holê). Hinek ji me, "ji me ra mîna dengen 'hê, xê, eyn, û xeyn'a Erebî peywist e", dibêjin. Hinek, "ji dengê dudemîn ya tîpa 'ç,k,p' û 't' ra tîspek din jî dixwaze", dibêjin. Hinek jî, "ji 't' û 'rya stûra dubare tîp peywist e", dibêjin. Û hinek jî ji me, ji van hemîyan ra tîpêni cûda û dubare tîp naxwaze dibêjin. Dîsa hinek ji me nuqte danîn li ser tîpa "i", hinek ji me jî danaynin.

Di nav me da yekîtiya li ser pêşvebirina zimêñ hê negihîjîtiye gehîneke dirist. Hinek ji me "ew peyvîn biyanî yêñ ku di zimanê me da cî girtine û jî alî gelê me ve jî têñ bikaranîn, divê di ciyêñ xwe da rawestin", dibêjin. Hinek jî "di ciyêñ wan peyvîn biyanî da, heker peyvîn Kurdi hebin, divê ew bêne bikaranîn û yêñ biyanî bêne derxistin ku zimanê netewî derkeve himatê" dibêjin û hinek din jî, "di ciyêñ wan peyvîn biyanî da, heker peyvîn Kurdi tunebin, divê bêne çekirin ku zimanê me zû ji peyvîn biyanî paqîj bi", dibêjin.

Di nav me da yekîti, li ser peyvîn herêman jî pêknehatiye. Hinek ji me

"dîvê herêmeke navendî bête bijartin, peyvîn wê herêmê esas bêne pejiranîn û peyvîn herêmîn din zêde pê neyê îlibar kirin ku zmaneke navendî bête himatê" dibêjin. Hinek ji me jî, "belê, divê herêmeke esas bête hilanîn, lê peyvîn wê herêmê û yêñ herêmîn din jî, rasten wan rast û çewtên wan jî çewt bêne pejirandin. Herêma navendî, tenê ji xwerûmayîna peyvan û rast-peyivînê tê bijartin. Pzo (ancak) bi vê rewşê yekîti û navendiya zimêñ pêktê. Ji bo pêşveçûna zimêñ û hevdû himbêzkirina herêman, pêkanîna vê yekê merc e" dibêjin û her yek li ser gotina xwe radiwestin.

Di nav me da hêj yekîtiya rastnivîsa peyvan pêknehatiye. Hinek ji me "pêwist" dînîvisin, hinek jî "pêwist" û hinek din jî "peywist" dînîvisînin. Dîsa hinek ji me "stran, strîk, strû, stêrk û hd." dînîvisin, hinek jî "sitiran, sitirîk, siturû, sitêrk û hd" dînîvisin û hinek jî istiran, istirîk, usturû, istêrik û hd" dînîvisînin. Xwezayî (tabî) yek ji van jî ne devokêñ herêman in. Heker devokêñ herêman bibûna, dê min maç bikirina, danîna li ser serê xwe û paşî li qaydêñ wan yêñ hevpîkî bigerama.

Di nav me da hêj jî, yekîtiya rastnivîsa zimêñ nehatiye holê. Her yek li ser rastiya bikaranîna xwe dixe-bite. Ev jî, ne devokêñ herêman in. Hinek jî me "ji min ra, di mal da" û "bi dîwîr ve" bikartînin û hinek jî, "ji min re, di mal de" û "bi dîwîr va" dixe-bitînîn. (Dibe ev devokêñ herêman be)

Di nav me da yekîtiya rêzimên, hêj jî tekûs nebûye. Heya niha çend libek rêziman hatine nivîsandin. Kî ji kîjan nivîskarî hez bike, "tu çewt î, di rêzimanê wî da tune, yêñ din jî hemî çewt in", dibêjin. Jixwe di nav rêzimanzanê me da jî yekîti pêk nehatiye. Di nav danîna hinek qaydan û rastnivîsîn rêzimanzanê me da hinek guhertin hene û nivîskaran jî ji nik xwe hinek guhertin li wan zêde kîrine. Ew rêzimanên me yêñ heya niha hatine nivîsandin, libek ji wan, ne ji alî encûmenêñ zaniyar ve hatine nivîsandin û ne jî, di sehiya (kontrola) wan da hatine derbaz kirin. Nexwe

ev rêzimanên me, digel naverokêñ xwe, hemî jî ji alî yek kesan ve hatine nivîsandin û di ciyêñ xwe da jî rawestane.

Di nav me da yekîtiya ahengiya civakî, hêj jî tekûs nebûye. Nexweşîyeke me yêñ civakî jî çavnebarî ye. Ev jî vegirtoxan xistine nav me û jê ra 'çavnebariya koloniyan' tê gotin; hêj di nav xwendayêñ me da jî didomîne. Çavnebarî di gehînekeke welê da ye ku gava ji hevdu çavnebarî dikan, herêmîn hevdu jî piçûk û xor dibînin. Tu dinêri ku yek ji herêma din ra: "ew ne Kurmanç in, ango bi Kurmançî nizanîn bipeyivin; lewra ez ji Kurmanciya wan fêhm nakim" dibêje û her wekî ku ne ji netewa bindest e, xwe pil jî dike. Dîsa tu dinêri yekê din radibe, kolonîtiya xwe ji bîr dike: "bizanîn ku ez Avropayî me, serê min jî, serê Avropayîyan e". Dîsa dibîni ku yekê din radibe, "ez gelek caran hatime girtin, min gelek hincirandin, cincirandin û cenceserî xwariye", bi me dide hesandin. Her wekî bi saya wî tenê doza Kurdan gihîjîtiye vê gehîneke dinimîne. Hemine ku ewê hatibe lêxistin û peyvek jî jê ra hatibe gotin, li nik min ew miroveke bi rêz û bi rûmete. Lî divê em bizanîn ku ne yek ji me tenê ketiye van tintêl û he-walan. Gelek rewşenbîrêñ Kurd di van deravan da hatine kuştin jî û hê jî têne kuştin. Divê em (xasime xwenda, dîti û rewşenbîrêñ me) xwe ji van nexweşîyen dijwar biparêzin. Ev rewşen han; kom, kes û civatan jar, bê kar û neçar dikan..

Di cîhanê da çiqas gel û netewêñ bindest yêñ di mercêñ me da hene, xar û jor eynî taybetî di wan da jî dixwiyêñ. Ew tovê dubendî û berberiyê ku ji ali iqtidar û netewêñ serdest ve, di nav netewe û gelê bindest da tê çandin, gava hişin be berê wî ev e ku me jî jor heya li vir dabaş jê kirî..

**Rewşen :** Avahiyêñ netewî nû çedîbin digel van gelmeşeyen li jor ku we dabasa wan kir serdanyar û di van mercêñ iro de, dê enstitü çawa bê xebitandin? Anku Enstitü bikare wezîfa xwe pêkbîne, divê ci bike?

**F. Huseyn Sagnîç :** Li vir jî dibê-

jîm ku xebitandina Enstîtuya Kurdî karekî ne hêsan e.

### SAZIMANA HUNDIRÛ

Berpîrsiyar û karbîdestêñ Enstîtuyê, divê serfesal, rewş, rabûn û rûniştina wan, tewr û livîna wan pir û pir tekûs û muntezem be.

Mêhvan û serdanyarêñ ji qaydê der ne tê da, yên din, dîvî bi rîkôpêk bêne pejirandin. Anglo roj û demijmîra pejirandina mêhvan û serdanyaran (ziyaretkeran) divê kifskirî bit û di hundir da domeka mayîna wan jî, divê bi rîkôpêk (muntezem) bêne sazandin.

Di çarçova rêzika rexnekirinê da, rexne divê hebe. Lê divê bi tu awayî destûra li hevdu iftîrakirin, di dijê hev da peyiîn, li hevdu bêbextî kirin tunebe.

Gava di nav karmendêñ (elemanêñ) Enstîtuyê da lêknehatinek hebe, divê di hundir da bête çareser kirin.

Divê kar û razên (sirên) Enstîtuyê, di Enstîtuyê da bimîne û bi tu awayî dernekeve derive.

Ewên xêlafêñ rêzika Enstîtuyê bibizivin, bimeşin û bipeyivin, pêşî bêne şiyar kirin. Di dubarekirinê da divê giran bêne şiyar kirin. Sifte, divê di Enstîtuyê da sê kursî bêne vekirin. Her kursî di nav gelempriya Enstîtuyê da, divê karêñ xwe yên taybetî, bi xweseriya xwe pêkbînin. Lewra kar û rewşen xebatêñ wan ji hevdu cuda ne.

1) Kursiya Dîrokê, divê ji çar encumenan bête himatê. Heryek ji van encumenan di nav gelempriya kursiya dirokê da, divê karêñ xwe yên taybetî bi serê xwe bikin.

a.) Encumena Yekem, dê ji menşeyê Kurdan dest bi dahûrandina menşe û dîroka Kurdan bike û heyâ 550 sal berî zayînê (mîladê) bîne, ku ew jî dema herifîna dewleta Medan e.

b.) Encumena Diwem, dê ji dema belavbûna dewleta Medan, angó 550 sal berî zayînê dest pê bike heyâ dema îslamê bîne.

c.) Encumena Sêwemîn, dê ji dema îslamê dest pê bike û heyâ sala

180 a mîladî bîne, ku dema serdestpêka bizavêñ Kurdî yên netewî ne.

d.) Encumena Çaremîn, dê ji dema 1800 ê mîladî dest pê bike heyâ roja me bîne, ku dîroka bizava neteweýa Kurd e. Dahirandina vê besa dawî, ji bo roja me pir grîng e.

Heger ji van her çar encumenan yek bête tercîh kirin, tercîha min ya dawî ye. Di her sê besen pêşî da zanîna dîrokê heye û bersiv ji pirsa "ez kî me" dide. Di her sê besen pêşî da ci hene, di ya dawî da jî, ew hene û bersiva pirsa "ezê çawan bikim" jî heye, ku roja me ra peywist e.

2) Kursiya Wêjeyê (Edebiyatê), divê ji sê encumenan bête holê. Her yek ji wan encumenan, di nav gelempriya xwe da, karêñ xwe yên taybetî divê pêkbînin.

a.) Encumena Yekem, divê li ser dîroka wêjeyê ya gelempri bixebite. Ew jî serdestpêka wê dervazê duhezar sal berî zayînê dibe, ku ji pêkhatina "Pirtûka Reş" dest pê dike.

b.) Encumena Diwem, Divê li ser roman û çirokan xebata xwe bidomîne. Ev xebat, divê li ser du hêmanan bête meşandin; yek, berhevandina afirînekîn nivîsandî. Dudu, rizgarkirina afirînekîn devkî.

c.) Encumena Sêwem, divê li ser helbeste û stranan bixebite. Divê jîna van her du çiqêñ wêja netewî, gavek zûtir rizgar kin.

3) Kursiya Zimêñ, ji sê encumenan pêktê. Ev encumenen vê kursiyê, ji yên kursiyêñ din zêdetir bi hevra peywendar in û peywendiya wan a gelempri jî zêdetir e. Lewra di hemî karan da jî, ciyê zimêñ grîng e. Ev encumen jî, mîna yên din di hundirî gelempriya xwe da, karêñ xwe yên taybetî dê bikin.

a.) Encumena Yekem, dê li ser teknika zimêñ (rêziman) û rastnivîsê bixebite. Rastnivîsa peyvan jî, peywira (wezîfa) vê encumenê ye. Gava bixwaze (icab bike), dê sehiya (qontrola) rastnivîsa nivîsandîñ din jî bike. Gava bixwaze destdan, ar jî rasderana (tesdiq kirina) elfabeyê jî peywira vê encumenê ye.

b.) Encumena Diwem, dê li ser xe-

zîna peyvan û çêkirina ferhengê bixebite. Berhevandina peyvan, ferhengan, biwêjan (terîman) û biryardana meshûman peywira vê encumenê ye.

c.) Encumena Sêwem, dê li ser zaravayê Zazayî (Dimili) bixebite. Wêje, teknik û ferhenga zaravayê Dimili, dê di destêñ vê encumenê ra derbaz bin.

Endamên Enstîtuyê divê mirovîn gran, zana, ji dil, dilovan di warê xwe de pispor û dilwaz bin. Divê Enstîtuya me bi enstîtu û zanîngehêñ Kurdî ra danûstandinê bike. Enstîtu û zanîngehêñ biyaniyan, yên bixwazin bi me ra danûstandina wecditînê (faydeditînê) bikin, divê em jî wan bê pêşber nehêlin.

Divê afirînekîn bi Kurdî nivîsandî bêne berhevandin. Qasî bi elfaba Kurdî nenivîsandî, bi rengeke zanistî bi elfaba Kurdî bêne nivîsandîn û çapandin (çap kirin). Afirînekîn derbarê Kurdan, yên ne bi Kurdî bin, divê bi Kurdî bête wergerandin û çapandin.

Ew zanîn û dahûrandinêñ ku Enstîtuya me li ser bixebite, divê ji hêmanê û ji nû ve destpê bêne kirin. Anglo ew afirînekîn heya niha ku derbarê dîrok û zimêñ da hatine nivîsandîn, ji ber ku di encumenen zanyaran ra derbaz nebûne, divê ji idayê nivîskaran bêne pejirandin û bi vî awayî ji hemiyan jî wec bêne dîtin.

Divê di derbarê xezîna peyvan da, tercîha herêmek li ser herêmeke din neyê kirin. Heke çewtiyên teknikî di peyvîn herêman da tunebin, divê ji wan ra çewt neyê gotin, piçûk û xor neyê dîtin. Gava peyvek, angó qaydekî zimêñ ji alî gundî û şivanekî Kurd ve hate bikaranîn, divê Enstîtuya me li ser raweste. Gava çewtiyâ teknikî tê da nehate dîtin, divê di ferheng û rîzimêñ da bêne cî krin.

Peyvîn biyanî yên di ciyêñ wanda peyvîn Kurdî heyî, divê bêne derxistin û yên bi Kurdî bêne bikaranîn. Ew peyvîn biyanî yên navnetewî yên di pêşberî wan da peyvîn Kurdî tuneyi, mîna "kêlo, mêtro, radyo, televîzyon, tren û hd", divê di ciyêñ xwe da rawestin.

**Soranî****Soranî**

# Basêkî Giştî Derbarey Kurd le Sovyetî Caranda

Mehabad KURDİ

Pêş her şitêk demewê destnîşanî xalêk bikem, ewîş eweye, ke nûsînî babetî mêtûyî yaxûd lêkolînewe pêwîstî be zanyarî zor û kat û serçawey hemecor û pişû firawanî heye. Xo ke dêyne ser mîllete kostkewtiwekey xoman, ewa her mepirse çend lêqewmaw û derbeder û bê xawen û zorlêkiraw û bindest û paşkewtû mawîn. Katê mirov rolekanî gelekey be awareyî û xerîbî debînêt, ewende riq estûrtir debêt û tif û laenet le dujmnan û dagîrkeranî wilatekey dekat. Qisekirdin le ser eme zor dexayenêt û em witares bo em mebeste terxan nekrawe. Ca lêreda deçîne nêv naweokî binçîneyî baseke wata Kurdekanî Sovyetî caran û çend layenêkî peywendîdar bem basewe.

Ger bimanewê basî Kurdekanî Sovyetî kon bikeyin, zor bas û xiwasî tîrîş dêne arawe, ke rastewxo ya na-rastewxo care pexwendiyekîyan debêt be babetekewe. Her bo nimûne: Mêtûy peydabûnî Kurd le Sovyet û çonyetiî hatinyan bo ewê û aye peywendî Kurd û Rûs le keyewe hatote kayewe û hoy eme çi biwe û çi nebi-

we? Legel gelê layenî tîrî hemeçesin. Ca bepêy tiwana û piştbestin be serçawê gelê kewe peyta peyta şordebînewe bo nawaxinî em babete qûlewe. Le seretada pirsiyarêk xoy qut dekatewe û Pêwîstî be welamdanewe debêt :

Kurdekanî Sovyet yan Kurdistanî Sovyet? Bo ewey bitwanîn weramî em pirsiyare bideynewe, wej nimûne çend serçaweyek dêniñewe û legel çonyetiî baskirdinyan lemer Kurdistan. Helbete agadarî eweşin ke bo maweyekî kem nawçeyekî otonomîdar le komarî Azerbaycanî Sovyetî benawî Kurdistan bûnî hebwe. Le paşan degerêynewe ser em meseleyeş.

Mêtûnûsî nawdarî Kurd Mihe-med Emîn Zekî le "Kurd û Kurdistan"e key da defermiwê:

(*Le eweli İslamyetda û le zemanî xelafetiî hezretî ûmerda, beşêkî wetenî Kurd lenaw-Azerbaycan'da û beşî na-werastîş le wilatî-Cizîre-da nîşan dira-we û amîl-walîş-Fatîhî meşhîr hezretî Eyaz kurî Xenem biwe... Le dewî xela-fetiî Emewîye û Ebasiyeşa be ferqêkî kemûzor eyînî teqsîmatî idare qebûl ki-*

*rabû û wilatî Kurdistan, lenaw wilati Cizîre, Eraq, Cibal, Azerbaycan, Mu-kan û Eran û Ermeniya û Rom dab û.)*(1) Profhsor V.F. Ménorskî le bârey Kurdistan ewe delêt:

*(Bo ewey cugrafîyay ew beşe le Asya diyarî bikeyin û lêy bikolînewe, pê-wîste dû şitî hawguncaw û tewawker bîr bixeynewe û ewanîş çiyakanî Eraqat û Kendawî Eskenderûnen.)*(2) Herweha yekê le rojhelatnasan bem şêweyey xiwarewe basî Kurd dekat: (*Netewyeke ke lenêw 5 wilatî corbe-corda wine, beşî zorî le wilatî Turk, Eran we Eraq, we beşî kemî le wilatî Suriye û Sovyetda dejîn. Ew netewye le mêtûda le here netewe konekan nas-rawe.*)<sup>(3)</sup> Ca ba bizanîn yekem nûser kîye ke bo yekemîn car wişey "Kurdistan"î bekarhênewe û kontirîn nexşey Kurdistanî kêşawe:

*(Yekem nûserêk ke nêwî Kurdistanî bekarbênewe, mêtûnûsî Fars, Hem-dulla Mistewî Qezwêni ye. Le kitêbe nûsrawekey 740 Koçîda-Nezhet Elqi-lüb-sinûrî Kurdistan bem core dest nîşan dekat: Le xorhelatewe Eraqî Ecem, le bakurewe Azerbaycan, le xo-*

rawawe Eraqî Arebî, le başûrewe Xuzistan. Bepêy nûsînekey Qezwînî Kurdistan ew katane şazde bajêr biwe. Hendêk lew bajérane ewro çîdî hewarney Kurd namawin. Dêrîntirîn nexşeyek ke nêwî Kurdistanî le ser tomor kîrabêt, ew nexşeyeye ke le salî 1561 da-A. Lafreri- le Roma le jêr serdêrla Descrittine delle Prima parte dell' Asia-da kêşaw tî.)(4) Serokî Rêkxirawey Maffî mirov û bersiyarêkî Lêbûrdinî Giştî Cîhanî Emnesty International, beşî Ostraliya, berêz-Jim Dunn- delêt:

(Kurd hejmara xwe wek 20 milyon didin zanîn. Piraniya wan, 10 milyon, îro li Tirkîyê bi cih dîbin, 5 milyon li Îranê, 3 milyon li Îraqê, û hejmareka ne biçûk li Suriyê, li hin beşen Yeketîya Sovyetê, û Libnanê.)(5) Hendê nûserî xoşman Kurdekanî Sovyet be Kurde Koçerekan yaxud ewaney ke le derewey Kurdistan dejîn, dejmîrin: (Bêcge lew Kurdaney ke le nawçê û hewarney resenî xoyan dejîn, jimareyekî zor û komelanî Kurdi tir beşêweyekî taybetî le hendê wilate dirawsêkanî Kurdistan dejîn. We ewane le hendê wilatanda kemayefî neteweyî pêk dênin, wek le Yeketî Sovyet û Lubnan.)(6) Heta Kurdekanî Sovyet be xoşyan : (Hemîşe çawyan leweye ke çî le-Kurdistan- ekeyanda rûdedat bew hîwayey ke rojê bêt bigerênewe bo wilati xoyan bo ewey tiwanay xoyan le pênavî peresendinîda bixene kar.) (7)

Helbete detwanîn gelê nimûney tîrîş bêñînewe sebaref bem base, belam baseke dirêj debêtewê û le tam derecêt. Lam wabê lem nimûnaney sereweda eweman bo derekewêt ke zorbey zorî ewaney le ser Kurd û Kurdistanyan nûsîwe, be degmen basî bûnî Kurdistanî Sovyetyan kirdiwe. Bêguman lem law lew laş renge govar û bilawkirawê hebin ke nawî Kurdistanî Sovyetyan hê nabê bêreda xalêkî zor giring heye ke şayanî baskirdine, ewîş meseley Kurd û Ermene. Her ke basî Kurdistan, taybetî Bakurî Kurdistan dekeyin, ewa bira Ermeniyekan lêman rast debnewe û her le deryaçey Gola "Wan" ewe, bigre le Urfe û Melatiye ra be xak û mulki

xoyan dezanîn û basî "Ermanistanî Gewre" man bo deken. Xiwanexiwaste min dijî gelî Ermenî bira nîm û nikolî le mêtjûy Ermeniyekan û Împriatoryeti Erminîya nakem. Be pêçewa newe Kurd û Ermen wek dû gelî bira le tenîş yekda jiyawin û çarenûşyan yek biwe le zor serdemî mêtjûyîda, belam dujminan kewtine nanewey nakokî le nêwan em dû geleda û sirînewey destî çewrişyan beser mîlletî Kurd da. Ca ba bizanîn yekê lewaney ke be çawî xoy le nizikewe rûdawekanî diwe û agadaryan biwe çî delêt û em mirovê helbet Ermenî biwe. (Robîn Paşay ermenî)(8) Le salî 1925 le rojnamey (Tiruşak)(9)î Ermenî jimare (243) le (Cenewa) le İtalya derbarey dûberekî nanewey dewletî Usmanî denûsêt:

(Leber ewe be wasîtey mînewiyate- we duşminayefî xistibwe beyniyanewe û bem sebebewe miwefeq bû bêzê Ermenî le eleyhî Kurd û bêzê Kurd le eleyhî Ermenî tehrîk ekird û fesadêkî gewrey xistibwe beyniyanewe.)(10) Meseley dananî Kurdistan be Ermenistan û bayexdan be berjewendî Ermen le ser hisabî gelî Kurd hestî zor le şâiran û nûseranî rakêşawe û basî em metirsiyeyan kirdiwe. Bo nimûne şairî netewey Kurd Hacî Qadirî Koyî defermiwê:

(Xakî Cizîr û Botan, yanî wilatî Kurdan Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan hîç xîretêk nemawî sed car qesem be Quran Peydabê Ermenistan, namêne yek le Kurdan...)(11) Helbete dewlete gewrekan bepêy berjewendî taybetî xoyan zorcar bayex be meseleyek deden û meseleyekî tîrîş wela denên. Meseley gelî Ermenî le salekanî şerî cîhanî yekemda yekî lew meselaney zilhêze- kan bû. Gelî Kurd be dirêjî sedekanî mêt û zulm û zorî lêkirawê û xakey qirtêrawe û letupet kirawê. Teniya: (... Le ber ewey le nawçekanî jû- rûy Kurdistanî Turkiyada Ermenî ejî zorcar em nawçane be Ermenistanî Rojava nawebrêن.)(12) Le kone nûsrawêkî İtalî le salî 1543 da hatiwe ke:

(Danîştiwanî Ermîniyay Gewre û

Biçûk zorbeyan Kurdish, mîlletêkî çiya- yî û cengawerin, ewaney le Ermîniyay Gewre dejîn zorbeyan le jêr deselatî Turkekanî, beşêkîs le jêr deselatî Far- sekanî, belam ewaney le Ermîniyay Biçûk dejîn serbexon û lejêr deselatî hîç kes nîn.)(13) Le heman katda bî- ruray tîrîş heye ke yek nagrêtewê le- gel rakanî tîrî pêşûda: (Îro Kurd le ser deşî Ermîniya dejît, ke pêş cengî cîhanî yekem Ermeniyekan lewê niş- tecê bûbûn.)(14) Herwek boman rûn debêtewê ta êstaş em meseleye gis- tu- go û miqomiqoy le ser dekrêt û be te- wawetî şînekrawetewe, M.S. Lazerêv delêt:

(Ew nawçaney le Sovyet Kurdi lê dejîn, beşêkî cugrafi Kurdistan nîn xakî Kurdistan. Be Kurtiyekey Kurdi Kurdistanî û hî nakurdistanîs hen. Ewaney Sovyet Kurdistanî nîn.)(15)

Lam wabê êsta norey ewe hatiwe, bo ewey bizanîn, aya peywendi Kurd û Rûs bo çî serdemêk degerêtewê? Be bîruray zorbey zorî zanayan û lêk- derewan ke lem babeteyan tojiwete- we, eweman bo derdexen ke peywendi Kurd û Rûs degerêtewê bo serdemî Rûsiyay Tezarî û şer û pêkdadan- kanî nêwan împrotoryeti Usmanî û Rûsiya:

(Be giwêrey ew serçawaney ke le- ber dest dan, detwanrê girîmanî ewe bikeyin ke bo yekem car peywendiye- kanî Rûsiyay Tezarî legel serok hoze Kurdekan beşêweyekî mêtjûyî degerêtewê bo seretakanî sedey nozdehem. Le layenî ramîyarşewe arezûy Tezarekan ewe biwe ke hêz û tiwanay cengî hoze kurdekan le çiwarçêwey sitratîyîti ser- bazî xoyan bekar bênen le dijî Usmanî- yekan.)(16) Qunsûlî Rûs le "Wirmê" le yekêk le belgename nihêniyekanî- da be aşkira danî beweda nawe ke: (Rûsekan be radey yekem le goşey da- mezrandinî Ermîniyay serbexowey seyrî kêşey Kurd û diwarojî Kurdyan ekird ke bewe rûs dû siyasetî ciyawazî heb- we beramber be Kurd û beramber be Ermen.)(17) Lîreda eweman bo rûn debêtewê ke dewlete gewrekan be her şeyek bê le zor kat û serdemda wîstûyane meseley Kurd bîgewşen- we le pênavî berjewende siyasi û ser-

bazî û abûriye taybetiyekanî xoyanda. Bêguman Rûsiyaş yekêk biwe lew zilhêzaney ke her bo heman mebest zor be gure û goliyewe hatote meydan. Peymannamey "Sayks-Pîko" salî 1916 belgeyekî aşkiray em witeye. Wek dîman Rûsiya hewlî ewey deda ke Kurd bika be qoçî qurbanî meseley Ermén û be berdêkîs dû çoleke bikujêt. Debê ewe dest nîşan bîkeyin ke siyasetî Rûsiya beramber be kêşey Kurd û xakî Kurdistan siyasetêkî negor nebwe, belku bepêy kat û şiwêngoraw:

(Bem core wek debînîn Rûsiya legel ewesda ke wek zorbey dewlete gewrekanî tir çawî birîbwe xakî Kurdistan û samanekanî belam xetêkî siyasetî diyar û dûrbînî beramber be Kurdistan nebwe, we zor car em siyasetey bepêy kat û şiwêngoraya.) (18)

Be giwêrey zorbey zorî serçawê hemecorekan eweman bo aşkira debêt ke peydabûnî Kurdkan be şêweyekî giştî le Rûsiya diway bestinî peymannamey "Gulistan" biwe, ke le salî 1813 le nêwan Eran û Rûsiyada morkirawe, û em peymannameye hendê le nawçe Kurdiyekan bûne parçeyek le Rûsiya. Kurdekanîş le wîlayeti "Elizabît Pul" da dejîyan. Paşan hendê le Kurdekan kewtine wîlayeti "Yerîvan", emeş bepêy rîkewtinnamey "Turkmancay" salî 1928 bû. Le kotayıda Kurdekanî herêmî "Qars" û "Erdehan" kewtine jêr deselatî Rûsiyawe. Diway berpabûnî şorîşî sosyalistî Oktoberî mezin, we be giwêrey peymannameyek ke le nêwan Turkiyay Kemalist û Rûsiyay Sovyetîda bestira "21 Adar 1921", nawçekanî Qars û Erdehan dûbare kewtinewe jêr deselatî Turkiya. Lew kataneda kurdekanî Sovyet zorbeyan le komarî Ermenistanî Sovyetda manewe û betaybetîş le nawçekanî "Talîn" û "Elagez". Lêreda gelê hoy mêtjûyî hen ke peydarbûn û derkewtinî Kurd le Sovyetî caran beyan deken: Yekem Herlenîwey yekemî sedey hejdehemewe hendê le hoze kurdekan wirde wirde kewtine cûle û pawanî ajelekaniyan firawan kird, le pêşda milyon berew deştî Yerîvan naw, pa-

şan bo nawewe û berew Azerbaycan berêkewtin û rîy "Beko" yan girteber. Le mawey em bilawbûnewe şenneyiyeda, dêy Kurdiyan lêre û lewê dirust kird, diyare ta radeyek deselat-daranî "Qeyserî" pêşwazî ew dest besera girtinêy Kurdekanîyan kirdiwe. (19) Helbete wek lepêşewe basman kird ke deselatdare Qeyseriye-kan deyanwîst sûd le neberdî û azayetî hoze Kurdekan werbigrin le katî cengekaniyanda le dijî dewletî Usmanî. Dûem Hoy ayînî ta radeyek roli xoy bînîwe le koçkirdinî kurdekanî Bakurî Kurdistan bo nawxoy Rûsiya. Her bo nimûne Kurde Yezidiyekan zorcar le layen serkirde musilmankanî împratoryetî Usmanî û Kurdekanîş çewsênrawetewe, çunke ewan peyrewî ayînî taybetî xoyan "Zerdeş-tî" kirdiwe. Sêyem Bûnî şer û sorî berdewam û zordarî dagîrkeranî Usmanî le mîlletî Kurd, renge way lege-lê le role kanî gele keman kirdibê ke serî xoyan helbigrin û koç biken bo cêga û şivenî tir be mebestî asayış û aramî. Bêguman cengekanî Rûsiya û Turkiya "1828-1829, 1853-1856, 1877-1878" roli xoyan hebwe lem kareda. Çiwarem Kurdekanî Turkmanistanî Sovyet newey ew hoze Kurdenen ke le sedey şanzehemda deselat-daranî Fars be zor le nawçey "Xurasan" yan nîştecê kirdûn bo ewey pasewanî sinûrî rojhelatî împrotoryetî Eran biken. Koloniye Kurdekanî "Ef-ganistan" iş her ew binereteyan heye û jimareşyan de hezarêk debêt. Ge-yiştinî Kurdekan bo Kazakistan û Qerxîz tazetir û lem diwayiyeda perrey send. Teniya le salî "1937-1938" dabû ke Kurdekanî Qefqas be ajaweci û têkderî sinûr tawanbar kirawîn û çend hezarêkiyan bo em komare dûraney Asiya ragiwezan. (20)

Ca êsta ba bizanîn jimarey Kurdekanî Sovyetî caran çende. Helbete katê mirov biywet basî jimarey Kurdekanî Sovyet bikat tûşî zor core bîr û ray cuda cuda debêt sebaret be jimarey danıştiwanî Kurd lem wilateda. Bo şikirdinewey em base çend nîmûneyek dêniñewê ke jimarey danıştiwanî Kurd pîşan dedat le Sovyetî

konda:

- 1) 125.000 kes / le salî 1910 "Teniya Kurdekanî Yerîvan û Qars" le kitêbî "Mînorskî, El-Ekrad, Bexdad 1968".
  - 2) 300.000 kes / 1945 "le nexseyekî Kurdistan ke pêşkes kirawe be kongirey Sanferansîskoy 1945"
  - 3) 250.000 kes / 1956 "B. Nikitine, Les Kurdes".
  - 4) 160.000 kes / 1965 "A. Ghassemloou, Kurdistan".
  - 5) 150.000 kes / 1970 "L.C. Vanli, Le Kurdistan Irakien".
  - 6) 100.000 kes / 1970 "R. Lamborn, Vörlids Politikens dagsfrägor nr5".
  - 7) 80.000 kes "C.J.Edmonds, Kurdish Nationalism, in Journal Cont. Hist vi: 1".
  - 8) 100.000 kes / 1974 "M. Baksi, Den Kurdiska frägan".
  - 9) 153.000 kes / 1979 "Be giwêrey amare resmîyekan".
  - 10) 300.000 kes / 1982 "P. Johnstone. WEC Intern. Research office, UK".
  - 11) 225.000 kes / 1987 "Selah Bedredîn, El-Ekrad şeêben we qezîyetên".
  - 12) 500.000 kes / 1990 "Bepêy qisey -Nezîrov- Keserokî Kongirey Kurdî bû le Mosko 26-7-1990".
- Wek le serewe boman rûn debête-we ta êsta jimareyekî rîkûpêk le mer danıştiwanî Kurd le Sovyet le ber destda niye. Herweha zor ciyawazî le nêwan jimarekanda debînre û zor kem û kurtiyan têda bedî dekrê. Helbete katê bêyin basî jimarey Kurdekan le komarekanî Sovyetî pêşûda bîkeyin ewa ziyatir tûşî zor meseley tir debîn. Jimarey danıştiwanî Kurd "salî 1970" bem corey xiwarewe diyarî kirawe (21):
- |                                     |                    |
|-------------------------------------|--------------------|
| Ermîniya                            | 37.486 kes         |
| Azerbaycan                          | 150.000 kes        |
| "kemtit bixemlêne"                  |                    |
| Corciya                             | 20.690 kes         |
| Kazaxistan                          | 12.313 kes         |
| Qereq                               | 7.947 kes          |
| Turkimanistan                       | 50.000 kes         |
| <b>KO</b>                           | <b>278.463 kes</b> |
| Berpîrsîyarî radiyoy Kurdî le Yerî- |                    |

van berêz Ehmedê Gogê Yosfiyan debêjêt: (*Le Ermenistan 60.000 Kurd dejîn.*)<sup>(22)</sup> Bêguman em jimaranej ke le serewe pişan diran ewe nageyenin ke degawdeg rastin. Be pêçewanewe lewaneye zor kem û kurtiyan lê bedibikrê, belam herçonêk bê le nebûn baştırin, we her ew jimaraneşman leber destda bû taku biyanxeyne pêş çawî xiwêneranewe.

Begiwerêy yadaştî kurdekanî Sovyet xoyan êsta kurd nek lesê ya le çiwar ya pênc komarda dejîn<sup>(23)</sup>, belku: (Dabeşkirawin beser no komarî ciyawaz.) Aşkiraye emeş hêndeytir meseley jimarey daniştiwanî Kurd be zehmettir dexat. Bêcge lemaneş rezisperistanî netewe serdestekan herdem wistûyane jimarey kurdekan kem bikenewe û tirs û tîror bilaw bikenewe lenêw kurdanda. Em kares be taybetî le Azerbaycanda xoy denwênêt. Bo nimûne şakiroy Miho denûsêt: (*Bepêy amarî serjimêrî salî 1921. Jimarey Kurd le Azerbaycanda 37.780 kes biwe û le salî 1926 jimareyan geyiştote 41.000, wate le mawey pênc salda le Azerbaycan kurd teniya ciwar hezarî ziyad kirdiwe. Le salî 1939 jimarey kurd le Azerbaycan geyiştote 6.000 kes, wate 35.000 kes kentir biwe le salî 1926.*)<sup>(24)</sup>

Diway berpabûnî şorişî Oktober le salî 1917 da goranêkî binçineyî le komelgay Sovyetîda rûyda. Herweha bûjanewey kultûrî û ferhengî gişt gelanî Sovyetî girtewe. Bêşik gelî kurd yekê bû lem gelaney ke be amancî xoy geyîst le çiwarçîwey Yekêtî Sovyetda belam bedaxewe zorî nebirdîsan rolekanî gelekeman dûçarî awareyi û derbederî û zordarî bûnewe:

(*Eger min be kurtî basî kurdî Sovyet bikom debêt bêjîm kerêgoy ewan berdewam deşt nebwe, beku çal hebwe, qort hebwe, şayî hebwe, şîn hebwe. Paş şorişî Oktober gişt mîlletanî Yekêtî Sovyet geyiştine azadî xoyan, kurdîş Le destûrî binereti Sovyetda tomar kira ke mîlletanî Sovyet yekin. Le salî 1923 da be hawkarî Lînîn le Azerbaycanda Kurdistanî Sovyet damez-rêndra ke paytextekey şarî Laçîn bû. Qutabxaney kurdî kirayewe, kitêb be*)<sup>(31)</sup>

*kurdî çapkiran, nûseranî kurd be zimanî xoyan deyannûsî, tiyatroy kurdî dirust bû, emane hemû bo kurdan şayî bûn, belam şayiyekeman zorî nexayand, le salî 1929 Kurdistanî Sovyet helwesêndra...)*<sup>(25)</sup>

"Aristova" delêt:

*(Kurdistanî Azerbaycan birîtî bû le nawçekanî Laçîn, Gulbajar, Kotolîn û Zingêlan. "Paşan le siyekanda em nawçane nawniran be herêmî Kurdistan. Detwanrê destnîşanî ew birûskeyyey Lînîn bîkrê ke bo serkomarî ew katey Azerbaycan "N. N. Nerîmanov" û nardiwe û le bergî 54 lapere 22 û karekanî tewawî Lînînda hatiwe: Pêwîstî yarmetîdanî hejaranî-Volgograd û Kurdistan be sercemî 40 milyon robl.)*<sup>(26)</sup> Ewey şayanî ba ke salî 1910 le dayik biwe û herdû kişiyan mamosta bûne û şierekaniyan babetî qutabxaneyan têda biwe. (27) Heta Kurd le sînemay Sovyetîşa basî kirawe, bo nimûne filmî "le jîr deselatî kurdekan" ke le salî 1915 da amade kirawe û basî rûdawe diltezênekanî ew kata-ne dekat be taybetî rûdawekanî sere-tay Cengî Cihanî Yekem (28).

Kurdekanî Sovyet hemîş şanazîyan be xebatî nepisawey gelekeyane-we kirdiwe le parça ciya ciyakanî Kurdistanâ û bepêy tiwana û lêhatû-yî xoyan û ewey le destiyan hatbê encamyan dawe le pênavî xizmet kirdînî ferheng û edebî kurdîda û berew pêşewe bîrîn û rajekirdinî mesele re-wakey mîlletekeman. Mamostay rehmetî Qanadî Kurdo (Emey Kurdi Sovyet şanazî be xebatî şorisgéraney Kurdi Eraqewe dekeyin) fermuyeti. (29) Izgî Radyoy Kurdi le Yerîvan be sê beş le berwari 24-25 /ab û 2 Îlonî 1987 da basî Bakurî Kurdistan û çalakiyekanî pêşmerge kurdekan û cengî partîzânî le Kurdistanî Bakur kirdibû<sup>(30)</sup> Herweha Kotî xoy Barzanî tiwanîbûy: (*Le salî 1956 geştek bikat bo komarî Ermîniyay Sovyetî û agadarî bar û doxî Kurdekanî ewê bîbêt.*)<sup>(31)</sup>

Barî abûrî û komelayetî emroy kurdekan le Sovyetî caran renge le zor layenewe başdır nebêt le bira hawzimanekaniyan ke lenêv xudî Kur-

distan be corehaşêwey dirindane de-çewsênrênewe. Herçende le katî xoyda hendê ray bem şêweyeş hebwe:

*(Kurdekanî Sovyet yekêkin le here hawnîştimane xoşguzeranekanî naw Yekêtî Sovyet... Mer û malatî xoyan heye û beşe zewî xoşyan heye bîkêlin... Xanûy taze babet le berd yan xiş, be-zorî gerimkirdinewey nawendiyan bo rakêşrawe û hendekîş telefonyan heye.. Hemû dêyek bepêy pêwîst awî xiwardinewe, elektirîk, telefon, dukanî xiwardemenî.. htd. têdaye. Tenanet le komarêkî geşekirdîly wek Ermîniya rîjey hoşmendantî Kurd wek rîjey hoşmendantî daniştiwanî Ermîniya berze... Hendek Kurd niwênerin le Encumenî Netewekanî Balay Sovyetda...)*<sup>(32)</sup>

Bêguman şêwey bîkirdinewey se-ranî Sovyet û bederkewtinî perestroyka û Glasnost xoy le xoyda le sûd û qazanî gelekeman daye û betaybetîs bo kurdekanî Sovyet:

*(Vê yekê feydeyeke mezin li kurdîn Sovyet jî kir. Edî ji wan re jî rî ve-bû ku mafênen xwe bixwazin. Ji ber ku weke min dîtî, Kurdîn Yekîtiya Sovyet hey dawiyê bi welatê xwe ve girêdayî ne û armanca wan jî tenê Kurdistanê serbixwe û azad e.)*<sup>(33)</sup> Gorbaçov be xoyşî carê le caran lewitarêkîda gutbûy: Debêt mîlletanî Sovyet Pêş bikewin, bo nimûne gelî ziyan geyiştîwe be Kurd û Tetar, debêt rîgây pêş-kewtinyan le ber demda bîkîrîtewê.

Kurdekanî Yekêtî Sovyet her le diway derkewtinî perestroyka û Glasnost kewtine xo û destiyan kird be dawakirdinî mafê zewitkirawekaniyan, be taybetî mafî bedîhênanewey nawçey otonomîdarî Kurdistan û damez-rondinî dezgay çapemenî Kurdi û gerandinewey elf û bêy Latînî bo nûsînî Kurdi û bilawkirdinewey rojname û govarî Kurdi û dawakirdinî helwêstêkî rûn le serkidayetî Sovyetî beramber be rûdawekanî Kurdistan û xebatî azadîxwazî gelî Kurd lepênat mafî çarenûsda. Herweha bo carî yekem le mîjûy niwêy Sovyetda konfransêkî zanistî seranseri yekêtî Sovyet be na-wî "Kurdekanî Sovyet "Mêjû û serdem" le 25-26 û Tîrmehê 1990 da bes-

tira û amadebiwan le gişt nawçe Kurdişînekanî Sovyetewe hatibûn bêcge le niwêneranî hêzê Kurdistani-yezan û derewey wilat. Helbete emeş serkewtinêk bû bo Kurdekanî Sovyet. Lem diwayeşa zor kor û komeley kulturî Kurdî le Sovyet damezrawe bo nimûne komeley Ronahî" le Gurcistanî Sovyet. Baskirdin le serem babetê û siyasetî sovyet leme meseley Kurd zor gûle û lem witareda cêgay nabêtewê. Bêge le me meseley Kurd le Sovyet betewawî dengî nedawetewê:

(*Komelgay Sovyetî Komelgayekî daxrawe, be daxewe wek pêwîst meseley Kurd le Sovyet dengî nedawetewê ... Barî Kurdab le sovyetîş le zor riwe we grêdrawe be barî giştiyewe.*) (34)

Zor rast û rewaye ke bigutrê Kurdekanî Sovyet, newekanî yekê le here çewsewakanî komelgay Kurd, êsta serkewtûtîrîn û xwendewarîtîrîn beşê gelî Kurd in. Peresendinî Kulturî û abûrî be hîç şêweyek nebote hoy ewey bibne Rûsi ya sîmay neteweyî xoyan win biken. (35)

Le kotayîda hîwadarim tiwanîbêtim basêkî serpêyî û giştîm derbarey Kurdekanî Sovyetî caran pêşkêş kir-dibê, helbete em babetê lewaneye bê kem û kuriş nebê, belam Kurd gute-nî: Kes le pirê nebwe be kurê!

\*\*\*\*\*

#### Perawêz û Serçawekan

1- Mihemad Emîn Zekî, Kurd û Kurdistan, çapxaney Darulsalam, Bexdad, L: 8.

2- V. F. Ménorskî, El-Ekrad, terceme we teêliq Dr. Marûf Xeznedar, Bexdad 1968, S. 12.

3- Krês Koçera, Mêjûy Kurd le sedey 19-20 da, wergêr: Mihemed Riyanî, çapxaney Karwan, beharî 1369/Taran, L: 33.

4- Cemal Nebez, Kurdistan û Şo-rişekey, Kurdo le Elmaniyewe kirdû-ye be Kurdî, Binkey Çapemenî Azad/Swed 1985, L: 364.

5- Ş. B. Soreklî, Em û Pirsa me, Weşanên Celadet Bedirxan-Sydney,

R: 45.

6- Selah Bedreddîn, El-Ekrad Şeiben we qeziyeten, Rabîtet Kawa Lîlseqafe El-Kurdiye, Et-tebee Elû-la-1987, Beyrût-Lûbnan, s: 89.

7- Peyv, jimare 4, sal 1/Nisan 1986, Witarî "Kurd le Yeketi Sovyetîda", nûsînî: Kendal, gorînî le Îngilîzî: Selam Ebdulla, L: 605.

8- Rojnamey "El-Îstîqlal" le jîma-re "1258" û 1/2-1931 tiyâda hewalî bestinî Kongireyekî hawbesî Kurd û Ermenî le Parîs bilawkirdotewe û delê: Le Ermeniyekan ewaney besdariyan Kird-Robîn Paşay Ermenî, Wahân Babazian, Hadia Beg û Fahor-nian Beg û le Kurdekanî Şerîf Paşa û Dr.Şukrî Mihemed Beg û...htd. Herweha ew kongireye biryari dana-nî lij neyekî bediwaçûn "mutabee" û dawe û le Beyrût ku debêtewê û le-wêş dîsan Robîn Paşa amade debêt.

9- "Tiruşak = Ala" rojnameyekî Ermenî biwe. Organî "Daşnaqêkan" biwe, le "Cenewa" le Îitaliya derde çû. Daşnaq hizbekî burjwazî netewe-yî Ermenikan biwe û lé salî 1890 da-mezaçrawe.

10- Karwan, jimare 68 Îlon 1988, witarî "serçaweyekî niwê derbarey peywendi Kurd û Ermen" be pênuşî: Ehmed Seyd Elî Berzîncî, L: 7.

11- Komele Şîrî Hacî Qadrî Ko-yî, Bexda 1925, L: 51.

12- N.A. Xalfîn, Xebat le rîy Kurdishana, wergerî le Rûsiyewe: Celal Teqî, Silêmanî 1971, L: 16.

13- Mêrella Gelêtî, Kurd û Kur-distana le nûsrewakanî Îtalida le sedey sêzdehem-nozdehem, wergeranî lê Îtalî: Casim Tewfiq, Stockholm 1987, L: 42.

14- Ketelogî Swêdî: Kurdistan, photo:N.Kasrian, text: Z. Arshi-K. Zabihi, Sverige 1990, sid: 15.

15- Mamostay Kurd, jimare 6, Beharî 1988, giftugoyek legel Kurdnasî Sovyetî benawbang M. S. Laz-rev, Enwer Qadir Mihemed le Rûsiyewe Kirdûyetî be Kurdî, L: 18.

16- Dirasat Kurdiye, El-Mêhêd El Kurdi, Parîs, El-Eded 2-1, Es-sene El-saniye, Kanûn El-Sanî 1985, meqalet "Xiyarat lîlsiyase El-Sovyeti-

ye tucah El Mesele El-Kurdiye, bîqelem: N. Bêkes, S: 75.

17- M. R. Hawar, Şêx Mehmedî Qareman û Dewletay Xiwarûy Kur-distan "bergî yekem", London 1990, L: 309.

18- Dr. Kemal Mezher Ehmed, Kurdistan le Salekanî Şerî Cihanî Yekemda, Çapxaney Korî Zanîyarî Kurd, Bexda 1985, L: 25.

19- Peyv, jimare 4, Nisan 1986, L: 598.

20- Heman serçawê, L: 600.

21- Heman serçawê, L: 598.

22- Kasêtî Radiyoy Kurdî le Us-tralia, Oktôberî 1990.

23- Berbang, jimare 61, November 1989, witarî "Perestroyka û barî jiyanî Kurdekanî Sovyet û daxwaziye-kaniyan" be pênuşî: Dr.Cemîd Hey-derî, L: 45.

24- Heman serçawê, L: 44.

25- Heman serçawê, Witey Nadî Nadrovendamî ekadimiyay zaniyarî leberde konferansî Parîs, L: 61.

26- Xalid, Xalid Es-siyase Es-Sov-yetiye tucah El-Qeziye El-Kurdiye fi El-Mîzan, Stockholm 1990, S: 46-47.

27- Tomabiwa, Jiyanî Kurdevarî, Ewaz zengene le ferensiye kirdûye-tî be Erebî, Hemeseid Hemekerîm le Erebiyewe kirdûyetî be Kurdî, Silê-manî 1980, L: 275.

28- Bo ziyatir agadarî birwane: Govarî Pereng, jimare 5, sal 4, man-gî yekî 1991, witarî "sînemay Kurdî û Kurd le sînemada" nûsînî: Burhan Şa-wî, wergêranî le Erebiyewe: Seyda, L: 24.

29- Peyv, jimare 1, Adar 1986, L: 82.

30- Dengê Kurdistan, hejmar 7, 20-10 1987, rûpel:21.

31- Mesûd Barzanî, El-Barzanî welhereke Elteherûriye El-Kurdiye 1945-1958, Kurdistan, 1987, S: 105.

32- Peyv, jimare 4, Nisan 1987, L: 600,601.

33- Berxwedan, hevpeyvînek bi Îs-met Şerî Vanlı re, 30.11.1990, rûpel: 21.

34- Berbang, jimare 61, L: 63.

35- Peyv, jimare 4, L: 606.

# ZMAN Û RASTNIVIS

F. Huseyn SAGNIC

Zman di kûraya dirokêda diafîre, di bnika xwe-  
da dewlemend dibe, dixemile, têkûs dibe û pêşve  
diherike. Tu gavê zman ranaweste. Lewra pêşveçû-  
na cihanê ji ranaweste. Gava pişeki nû tête afirandîn,  
mitleq navek lê tê danin. Ew nav dibe peyvek  
û dikeve nav zmanan. Ew peyv, an gelên cihanê bi  
zmanê xwe werdigerinîn, an her kes gorê zmanê  
xwe bi lêv dike, an ji ji hêmana wêra sadiq diminin  
û bikartînîn. Her bi ci rewşê dibe bla bibe, her kes  
gorê teknika zmanê xwe di kêşananda, di hevedu-  
daniyanda, di qedinekanda (izafanda-tamlamanda)  
û di he cokanda bikartînîn. Bi vi ewayi ji û bi  
peyvên biyani ji, zman rojbiroj dewlementir û tê-  
kûstir dîbin. Xwezay (tabii) bi pêşveçûna avatan û  
bi guhertina sazimanîn ji peyvên nû têne afirandin  
û di bnika zmananda ciyên xwe digirin. Disa zman  
dewlementir û têkûstir dîbin. Lê divê bi hajdari  
hay ji vê yekê bîminin ku ji qaydêñ zmanan derne-  
kevin û di bnika qaydêñ zmananda bêne ghandin.  
Heker ne, zman ji ciyên xwe dileyzin û sergeste  
dîbin.

Rêzman jî hundirê zmanan derdike-  
vin û di nav qaydêñ xwe yên xweserda  
tekûs dîbin. Qaydêñ her rêzmaneki cu-  
da-cudane û di bnika zmanêñ xweda  
derdikevin. Lê di bnika zmanêñ serges-  
teda hemi qaydêñ rêzimêñ dernayêñ.  
Jî ber vê yekê ye ku ji ali rêzmanivisan  
ve hîndek qaydêñ rêzmanêñ wan zma-  
nêñ sergeste têne çêkirin.

Heya van salêñ nêzik, zmanê Kurdi  
bi ewayek rêkûpêk hatîye. Qaydêñ rêzi-  
mani û rastnivis ji bi rêkûpêk hatibûn.  
Ew hozanêñ me yên di nav gelda derke-  
ti û yên di medresanda ghêsti, xar û jor  
bi yek rewşê rastnivis û qaydêñ rêzima-  
ni bikaranine. Gelek afirinekêñ wêjeyi  
(edebi) û folklorik ji afirandine û xisti-  
ne bin xizmeta gel. Hê ji gelek ji wan  
hene ku eyni xizmetê bikartînîn.

Cawan me li jorê gotibû: "Zman di  
bnika xweda tekûs dibe". Ne ku bi gu-  
hertinê û bi zordayinê tête mûdaxêleki-  
rin. Gava bi vê tentêlê dest bi zmanan  
hate krin, ji peşilandînê zêde tu havi-  
lek jêra nayne. Dî derbarê zmanêñ drîs-  
da ne reform, ronesans tê hzîrandin.

Zmanê Kurdi digel rêzman û rastnîvisa xwe  
zmaneki rast û drîste, ji ali wêjekar û hozanane xi-  
mekê pîr qayim hatîye avêtin. Her çqas beşek hîn-  
dik jê bi dest me ketîye, lê afirinekêñ me yên wêjeyi  
yên nivisandi gelek hene. Anglo qasi afirinekêñ bi-  
yaniyan yên wêjeyi hene û hêdi- hêdi bi dest dike-  
vin. Qenc lê binêrin, selahiyeta tu kesi nine ku çew-  
tiyên wan afirinekan drîst bike, ne ku rastnîvisa  
wan biguhere. Heker çareki jêra neyê ditin, bê se-  
dem wê du rastnîvis derkeve hmatê ku ev ji nayê  
bexîsandin. Lewra di vê mjarêda geleke ji afirine-  
kêñ nivisandira sadiq bîmana.

Xwendevanêñ hêja, ez nabêjîm bi tu ewayi rast-  
nîvis nayêñ guhertin. Belê, têne guhertin. Lê se-  
demêñ peywîsti jêra dixwaze. Jî bo guhertina rastnî-  
visa kevnare, devoka herêmek ne sedemeke drîste.  
Gorê afirinekêñ me yên nivisandi yên kevnare û  
beşek ji yên nû, guhertina rastnîvisê ne gorê devo-  
ka herêmekê ye ji. Dî vê mjarêda ezê gelek mina-  
kan bîdim, dixwazim ku xwendevanêñ me wan mi-  
nakân di eyni pirtûkanda bîxwinin û bê bandor (te-

sir), bûryara xwe ya bî sedem peywisti ji me ra verê kin. Afirinekên bî dest me keti emê ji hemiyan ji minakan bîdin, navêwan û navênvîskarêwan ji bînivisinin. Emê ji du diwanan her yekê nivê hilbestekê jê bîdin û ji yên dîn ji parce ji wera pêşkêş bikim.

Dabaşa me li ser qertafa "da, ra" ye ku nha "de, re" tetê nvisandin. Bêweku "di malda, ji munra; di malde, ji munre" dînivisin. Bî heve nvisandin û cuda nvisandina van qertaf û peyvan mjarek dîne, paşı ezê dabaşa wan bikim. Anglo ezê ditina xwe pêşkêş bikim.

#### Minak:

Bî narê firqetê suhtum, ji ferqê serhetê pêda  
Xedenga xefletê nuhtum, ji berqa lamia têda  
Xedenga firqetê re'de, dilê ew xefletê lêdit  
Dibêjum wer cebel bit ew, bî ker bit wê di gavêda

Heçi firqet nedî hicran, nebê dax û key lêne  
Ji bil derbê di hicrani, fraqa roh û can kê da  
Ji her bê dax û bê derdi, mepursin muhneta işqê  
Çi zanun bê xeber jana, dilê dax û keser têda  
Kesê muhnet diy û firqet, vexwari cureya hicri  
Giri wan tê bî halê min, di vê hicran û zecrêda  
Bî dama muhbetê bendim, xedenga firqetê dil nuht  
Bî şubhê murxê nim besmel, di hev wertim di xwunêda

Burûska batini da dil, di pêtê sine wê werbû  
Ku dê bêtin tebita dil, di nav wê nar û pêtêda  
Ji ulfê şubhetê zulfê, mudam lew bê qerârim ez  
Ku canê mun eziz iro, çû û dil wê di ulfêda  
Ji mehbub dûr kirim çerxê, felek wê pir hilavêtim  
Nizanim dê li ko dit mun, di vê dewran û çerxêda  
Hebibi bê xeta kuştum, bî derba firqetê axir  
Ji wê rojê dizani min, ku yar ew tir li cengê da..?...

Diwana Mela,  
Mele Ehmedê Cziri

Ezum iro li meyxanê, dikim perwaz di camêda  
Li ber cengê direqsum ez, dikim nalin di nayêda  
Bî nayêra dinalim ez, ji soza dil dikalim ez  
Ji şewqa şahidê saqi, dixwum ez mey peyalêda  
Dixwum ez mey bî şehkasa, ji dêma luelo elmasa  
Şeraba dilbera xasa, nesibê min di amêda  
Di amêda ezum serdar, li nêv yaran ezum dildar  
Di işqêda ezum xwunxwar, ciger nare di pêhîeda  
Me sine pêht û atesbû, me hêstir ji dideyê reşbû  
Me tali sorgula geşbû, me di iro di falêda

Me falek müsteri lami, digel wi zuhare bû tabî  
Nucumê seedi bûn camî, me tali da di bircêda  
Di burca seedê eşrefda, li bedra xelqa erqemda  
Bi tac Cimşid û Ercem da, di babê nor û husnêda  
Di babê husn û rewşenda, ci şewqek tacû û şeh-  
per da

Lî dêm xurşid û mermer da, me exter da di işqêda  
**Diwanê İrfan, M. Qedri, Cziri**

Heçi ku dibêjin ewelile, ew ille ji bo tera delile  
Ez dê bi cenazeyê wirâ bim, hetta weku meqbe-  
ran teba bim  
Zinê dikujim meger bi emda, tobaye di cenneta  
heremda  
Girêdayi di paxila Memêda, Mem mayi di heybet  
û xemêda  
**Mem û Zin, Ehmedê Xani**

Bî tûlê nasêtanêra, vexwendim mir bi dergahi  
Bî vi çavi hebib ditim, şukur ev şefqe mewli da  
**Diwana Mela,**  
**Mele Ehmedê Cziri**

Dilo rabe dilo rabe, veke çavan ku êvare  
Nezano bes di xewda be, ji newmêra mebe yare  
Dinê qence ji mîranra, eceb mulke ji şîranra  
Ku ava ken ji xeyranra, eceb mezra û eqare

**Diwan,**  
**Feqiyê Teyran, Hizani**

Her yeki westabû têda çendêsal, lê eded mespare  
ûlmê layezal  
Ni ji darê xwarin her dukan şêrin, huleyê cennet ji-  
benêda firin  
Rohnikê wi şin kirin dar û nebat, çûn di erdêda  
du pa û mayêmat  
Rabe mizgini bibe ji mexloqêra, ji asêman û erd û  
ta texte sera

**Mewlûd,**  
**Mele Ehmedê Bateyi**

Hemd û sena rebi ji tera, Eli li dinê gelki gera  
Qe wi ne di dostek ji xwera, gêr bî di roja tengiyê  
Eli rabe heta kengi, tu xafil bî bi vi rengî  
Biso qelbi ji vi jengi, here rîrast di cehdêda

**Diwan,**  
**Seyid Eliyê Fındıki**

Bêtin bî me ra li koh û deştan, reh şubhetê teyrekî  
bûhiştan

Weqtê kubihist ev Yehoda, şefqet  
geriya ewi di dilda  
**Yusuf û Zuleyxa, Selim**

Mesned ji tera têbaqê eflak, huccet ji tera beratê  
lewlak

Ahoki letif û xob têda, gava ku nezer bi çavê lêda  
Vêra kete rê û çûn bi hevra, sirê xwe ewan digo ji  
hevra

Leyla bi xwe hat di vê demêda, neşter li reha di  
maxê min da

**Leyla û Mecnûn, Suwad**

Da me puserek bi şubhê bedrek, çêkur ji mera ji  
nûve sebrek

Gul ma di heqiqe emelda mey xwari di kaseê  
ecelda

**Leyla û Mecnûn,  
Şêx Mehmed Xan, Aqtepeyi**

Şehidê çesmê celladim, hewadarim bi bejnêra  
Di ulmê işqê neqqadim, riwayet kim ji amêra  
Bi lef bêñ kisuwê taze, bi saz û coş û awaze  
Ruxê aşiq dibit xaze, ji ber tirê di cergêda  
Zarezarêñ min di dilda, ji firqeta şemsa humul da  
Çûn heta mulkê çigulda, cowê xwinêñ di min

**Diwan, Mele A. Rehman, Aqtepeyi**

Tu keysayê bezma surorê xwida, çiraxê hidayet bi  
destê teda

Qusur ger hebitin di şura meda, fitor ger zihor bin  
di fikra meda

**Rewdetuneim,  
Mele A. Rehman, Aqtetepeyi**

Ellahê ji zatê xwe müşkatâ di kenzida

İşqek ji xwe hulkar misbah bi şûşêda

Gilkê ezeli gira neqşê ebedi vêra

Ayatê kîrîn bahur durek bi sitarêda

**Diwan,  
Muhemed Kerbelayi, Aqtepeyi**

Çi xwes dadê wudo bestum di dewê weduhaeda

Tehor bû dul bêla şubhe bi herfê taê tahaê

Dibêñ şehzade çû cem yarê cani

Du destîen xwe di gerdenda werani

**Seyfulmulûk, Siyapoş**

Qenc dêna xwe bîdînê, ji gelek herêmên Kurdistânê minak ji pirtûkên wêjekaran, nav dîgel ciyêñ wan, me nvisandin. Teni ciyêñ sê hozanan (Selim, Suwad û Siyapoş) em nîzanin. Lî ji kêjan herêmê dibin bla bibin, wan ji mina yên din "da, ra" bikarânine.

Pışti guhertina van her du qertafan Ewêñ dî bîn bandora guherandinêda mane, teni ew "de,re" bîkartînin. Ev serdestpêk, pışti çarika pêsi ya sedsala bistan derketiye hmatê(holê),

Hêvidarm, bî alikariya hşê drîst, emê ji bin vi bari derkevin û çarekê hismendi jêra bibinin. Bîminin xwes.

### Dê budomine

### ÇAVKANÎ

Rûpel	Rêze
1. Diwana Mela, Mele Ehmedê Cziri (Şerha Diwanê)	35
2. Diwanê İrfan, Muhammed Qedri Cziri	77
3. Mem-Zin, Ehmedê Xani	
4. Diwana Mela, Mele Ehmedê Cziri (Şerha Diwanê)	48
5. Diwana Feqiyê Teyran (helbesta 'Dilo Rabe')	2-9
6. Mewlûd, Mele Ehmedê Bateyi	6-10-19
7. Diwana Seyid Eliyê Fındıki	
8. Yusuf-Zuleyxa, Selim	5-7
9. Leyla-Mecnûn, Suwad	4-22-29
10. Leyla û Mecnûn, Şêx Mehmed Xan, Aqtepeyi	16-138
11. Diwan, Mele Abdurrehman, Aqtepeyi	2-80
12. Rewdetuneim, Mele Abdurehman, Aqtepeyi	203-259
13. Diwan, Muhemed Kerbelayi, Aqtepeyi	6
14. Seyfulmulûk, Siyapoş	31-152
	4-4
	2-8-11
	13-6
	11-6-12-15
	10-3
	3-5
	5-8

ŞANOYA  
**Jiyanâ Nû**

**Mirin û Jiyan**  
**(Listik / Du Perde)**

Hüseyin KAYTAN

**Perdeya Diwemîn  
Sahneya Diwemîn**

*(Şikeftek... Gerilayek birîndar.  
Nikare bimeşe û rabe ser piyan.  
Milîsek bi lez tê hundir.)*

**Gerila :** Heval, te av anî, av?

**Milîs :** Leşker têñ. Gundî  
jî li paş! Dor û rexê me girtine!

**Gerila :** Bila bêñ, heval, bi-  
la bêñ... Jixwe bêhna min teng  
bûbû...

**Milîs :** Li gund serhilda-  
nek çebû. Me gelek şehîd da.  
Ji wan ên xelasbûyî têñ vê de-  
rê. Leşker jî li paş! Ger me bi-  
bînin, dê me bikujin!

**Gerila :** Pêşî divê em yekî  
ji wan bikujin, matarek av jê  
bistînin, vexwin, emê dîsa bi-  
mirin...

*(Gundî, yek bi yek têñ hun-  
dir. Di himbêza jinekê de za-  
rowê Xecê heye. Zarok bi den-  
gekî bilind digri û nasekine.)*

**Xecê :** Merhaba ji we re!

**Milîs :** Ew gerila ye. Gerilaye-

kî birîndar. Nikare bimeşe û ra-  
be ser piyan...

**Xecê :** Gerîla... Tu pîroz î,  
berxê min. Weke axê, weke nan,  
weke welat... Kurekî min jî wek  
te servan e. Navê wî Zinar e. Tu  
wî nas dikî?

**Gerila:** Belê, yadê, belê! Ez

**Jinik 1:** Xuşka Xecê, zaroka  
te nasekine! Bigre, wê bihewîne.

**Dapîr :** Lê ew çîma dignî? Eş-  
kere ye ku derdekî wî heye! Şîr  
bide wî!

**Milîs :** Leşker têñ! Pir nêzîk  
in! Dengê wî bibirin. Eger wê bi-  
bihîsin, dê me tev bikujin... Şer-



wî baş dizanim. Ew gerilayekî pir  
bi rûmet e. Şervanekî pir mezîn  
e.

van, çiqas fişengên me hene?

**Gerila :** Nêzîkî deh heb. Bes  
in.

**Milis :** Ji bo sêsed leşker deh heb fişeng! Pir baş!

**Jinik 1 :** (Bi dengekî bilind) Ewê bibe sebebê me tevan! Dê me tev bide kuştin! Dengê wî bibirin! Wî bikujin, wî bikujin!

(Pariyek bêdengî)

**Gerila :** Metê, emê vî zarowî çawa bikujin! Zarok jiyan in, zarok hêvî ne! Emê çawa bikujin! Zarok nayêñ kuştin! Pêşî divê hûn min bikujin!

(Gerila, dike ku rabe ser piyan, nikare. Bêdengî)

**Xecê :** Hevalno! Min di ber axa xwe de, di ber azadiyê de gelek êş kişand. Ev zarok jî, hîna nehatibû ser rûyê dinyayê, min ji bo gerîla qurban kiribû! Ha ji we re, hûn ci jê dikin, dikin! Lê ez nikarim! Ez nikarim wî bi destê

### Perdeya Diwemîn Sahneya Sêwemîn

